e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi
*Journal of Oriental Scıentific Research (JOSR)* www.esarkiyat.com ISSN: 1308-9633

*JOSR* Nisan-2017 Cilt:9 Sayı:1 (17) (s. 107-132) *JOSR* April-2017 Volume:9 Issue:1 (17)

# KURTEDÎROKA ÇAPEMENÎ Û MEDYAYA ZAROKAN A KURDÎ

**Kenan SUBAŞI***

**Kurte**

Ev xebateke bîblîyografîk e ku bi taybetî medya û çapemeniya kurdî ya zarokan berçav kiriye. Ji aliyê çapemeniyê ve kovarên zarokan hatine nasandin û ji aliyê medyayê ve jî televîzyon û bernameyên televîzyonê hatine nasandin. Berî danasîna berheman qala têkiliya zarok û medyayê hatiye vegotin. Di vê çarçoveyê de têkiliyeke çawa heye û tesîrên dualî di navbera wan de çawa çêdibin, hatiye nirxandin. Piştre dîrok û geşedana çapemenî û medyaya kurdî ya zarokan di bin pênc sernivîsan de wek xebatên li Tirkiyeyê, Ewropayê, Iraqê, Îranê û Sûriyê hatine veguhastin.

**Bêjeyên Sereke:** Çapemenî, Medya, Zarok, Kurdî.

## KÜRTÇE ÇOCUK BASINI VE MEDYASININ TARİHÇESİ

**Öz**

Bu çalışma bibliyografik bir çalışma olup özel anlamda Kürtçe çocuk basını ve medyasının tarihçesini ele almıştır. Basın bağlamında çocuk dergileri tanıtılmış olup medya bağlamında ise çocuk televizyonları ve çocuklar için televizyon programları tanıtılmıştır. Eserlerin tanıtımından önce medya ve çocuk ilişkisi açıklanmış ve bu düzlemde nasıl bir ilişki varolduğu ve aralarındaki iki taraflı etkinin nasıl gerçekleştiği değerlendirilmiştir. Sonrasında Kürtçe çocuk basını ve medyasının gelişimi ve tarihçesi Türkiye, Avrupa, Irak, İran ve Suriye'deki çalışmalar olmak üzere beş başlık şeklinde aktarılmıştır.

**Anahtar Sözcükler:** Basın, Medya, Çocuk, Kürtçe.

## THE HISTORY OF KURDISH CHILDREN'S PRESS AND MEDIA

**Abstract**

This paper is a bibliographic study and tells the history of Kurdish children's press and media in a special sense. In the context of the press, children's magazines are introduced and in the context of media, children's televisions and television programs for children are introduced. Before the introduction of the works, the media and child relations were explained and in this context, the relationship between both of them is explained. Subsequently, the development and history of the Kurdish children's press and media were reported in five titles, such as the works in Turkey, Europe, Iraq, Iran and Syria.

**Keywords:** Press, Media, Children, Kurdish.

Makale Gönderim Tarihi: 10.03.2017, kabul tarihi: 10.04.2017.

* Xwendekarê Doktorayê ye li Zanîngeha Dicleyê di Beşa Ziman û Çanda Kurdî De / Phd Candidate at Kurdish Language and Culture Departmant in Dicle University. E-mail: kenanenado@gmail.com

*JOSR* Nisan-2017 Cilt:9 Sayı:1 (17) (s. 107-132) *JOSR* April-2017 Volume:9 Issue:1 (17)

**Destpêk**

Çapemenî û medya bi navekî xwe yê din qadên ragihandina giştî, her ku diçe ji bo sosyalbûn, pêşketin û nasîna dinyayê wek qada herî girîng tê hesibandin. Bi taybetî tesîra pêşketina kompîtûr û teknîkê ya li ser vê qadê, wek ku dinya li ber destên mirovan kiribe mîna gundekî biçûk. Êdî mirov kengî bixwaze, dikare li her derî xwe bigihîne her agahiyên hewce. Ji ber vê yekê jî êdî ne pêkan e ku di navbera çand, ziman û îdeolojiyan de reqabet çênebe. Ji ber ku em dizanin rewş wiha ye, divê em di vî warî de hay ji rewşa xwe jî hebin. Ji bo vê yekê jî di vê gotarê de em ê bi giştî qala medya û çapemeniya zarokan bikin û piştre jî daxilî nav dîrokçeya çapemenî û medyaya zarokan a kurdî bibin.

Gelek kesan qala medyayê û pênaseyên wê kirine ku çawa dest pê kiriye, pêş ketiye û di nav xwe de çi dihundirîne û hwd. Heke mirov bi awayekî giştî binirxîne, mirov dikare bibêje ku medya ji amrazên wek telefon, tele-foto, faks, hîpermedia, multîvîzyon, slayt, pirtûk, satelaytên ragihandinê, vîdeotekst, vîdeo, kompîtur, înternet, sînema, rojname, kovar û çapemeniya elektronîk pêk tê ku bi rêya nivîs, deng û dîmenê, di navbera girseyên civakê de dibe qada ragihandin, tesîrlihevkirin, hevbirêvebirin û perwerdekirinê. (Kardaş û Alp 2003: 65) Em dikarin bibêjin ku medya bi çêbûna çapxaneyan dest pê kiriye û heya roja îro, bi pêşketineke teknolojîk gihiştiye asta ragihandina elektronîk. Piştî pêşketina teknolojiya ragihandinê ya elektronîk, êdî mimkun e ku mirov di her qada jiyanê de medyayê bibîne. Ev jî li gorî ku hatiye dabeşkirin, dibe ku carinan amrazên heyî, bi awayekî periyodîk an jî neperiyodîk, di nav jiyana mirovan de cihên xwe bigirin. (Marsil 1998: 16) Hin kes ji pênaseyên giştî zêdetir li ser hêza medyayê û tesîra wê rawestane ku medya hem ji bo zanîn, agahdarî, kêfê, dembuhurandina mirovan derdorekê ava dike hem jî dibe sedema avabûna şirketên bazirganî yên organîzekirî. Ji bilî vê medya, tesîreke xwe ya mezin li ser jiyana mirovan heye ku mirov bêyî wê nikarin ji bo şêwaza jiyana xwe, kêf û şahiyên xwe, nirxên xwe yên çandî biryareke serbixwe bidin. (Avşar 2014: 6)

Medya di pêkanîna ragihandinê de bi rêya amrazên xwe yên heyî, dixwaze ku agahiyek, nêrînek an jî tevgerekê biweşîne û nîşan bide ku ev wek prosesekê pêk tê. Di vê prosesê de hin kiryarên medyayê derdikevin holê ku ev jî agahdarkirin, perwerdekirin, kêfxweşkirin, danasîna mal û xizmetguzariyan, bawerîpêdan, tevgerandin, balkişandina li ser xalên diyarkirî, veguhastina çandê ya di navbera nifşan de ye. Dema ku mirov bi medyayê re kete nav têkiliyekê, ev kiryar hemû rû didin. (Çokan 2005: 298-303)

**1. Zarok û Medya**

Têkiliya zarok û medyayê gelek bi hêz e. Egerên ku vê têkiliyê bi hêz dikin yek jê dîtbariya medyayê ye û yeka din jî cazîbedariya medyayê ya ji bo zarokan û hesta meraqa wan e. Êdî pir eşkere ye ku medya ji bo sosyalbûn, geşedana zihnî û zimanî, siyasîbûn û bidestxistina fikr û îdeolojiyên cuda yên zarokan, xwedî tesîreke mezin e.

Têkiliya medya û zarokan hem piralî û hem jî pevgirêdayî ye ku *Mustafa Ruhi Şirin* di vê bareyê de baldariya xaleke girîng bi vî hawî vedibêje: "*Di navbera medya û zarokan de têkiliyeke yekalî tuneye, her gav têkilî dualî ye. Egera vê ya sereke jî ew e ku hemû zarok û hemû ekran, ne wek hev in. Her wiha naveroka medyaya çapkirî, elektronîk û*

*dîjîtal ji hev cuda ye.*” (Şirin 2014: 183) Îroroj êdî tenê televizyon û amûrên çapkirî xîtabî zarokan nakin, ji bilî van amûrên mobîl, medyaya sosyal, lîstikên înteraktîf û vîdyoyên li ser înternetê jî ketine nav jiyana civakî û şexsî ya zarokan. Her wiha wek ku di gelek qadan de heye, di vê qadê de jî newekhevî pir in ku ev newekhevî; çawa ku di navbera parzemîn û welatên cuda de hebin, bi heman awayî di navbera bajaran de jî hene. Bi milyonan zarok hene ku dibistanek bi destên wan nakeve û gelek zarok hene ji pirtûkeke kêrhatî û medyayeke naveroktije bê par in û berevajî van zarokan, hin zarok jî hene ku ji roja hatine dinyayê û pê ve di nav medyayeke nûjen de bi amrazên nûjen re hemhal in ku ev yek jî têkiliya medya û zarokan di bergeheke din de berçav dike. (Şirin 2014: 181)

Xaleke girîng a din a di peywendiya medya û zarokê de ew e ku zarok, di medyayê de wek bikerekî aktîf cih nagire û medya jî bi qasî ku hewce ye qala zarokan û mafên wan nake. Di lêkolînekê de ev bêahengîya di vî warî de ya li cîhanê hatiye berçavkirin. Li gorî *Federasyona Rojnamegerên Navnetewî*; li ser rûyê erdê di demografiya mirovan de para zarokan ji sê paran dudu ne, lê zarok para xwe ya di medyayê de bi tenê ji sedî pênc in. (Vgz. Sayılan û Çevirgen 2014: 105) Ji bo telafîkirina vê kêmasiyê di Nîsana sala 1997an de *Lijneya Mafên Zarokan a Neteweyên Yekbûyî* li navenda UNESCOyê civînek li dar xistin û di çarçoveya madeya 17. a *Peymana Mafên Zarokan* (mafê zarokê heye ku xwe bigihîne agahiyên lazim) de nexşerêyeke ji 12 pêşniyaran pêkhatî, amade kirine. Di vê nexşerêyê de pêşniyarên ku hatine kirin ev in: (BM Çocuk Hakları Sözleşmesi 20 Kasım 1989)

1. Divê medyaya zarokan a serbixwe hebe.
2. Divê malperên zarokan ên li ser înternetê hebin.
3. Divê pirtûkxaneyên aktîf ên zarokan hebin.
4. Divê ji bo zarokan perwerdeya medyayê hebe.
5. Divê piştgirî ji bo zarokan hebe da ku di medyaya xwe de li kar bin.
6. Ji bo ku zarok ji zirarên medyayê bên parastin, divê xebatên erênî bi saziyên medyayê re bên kirin.
7. Divê planên netewî bên çêkirin ji bo ku dê û bav di piyaseya medyayê de bên bihêzkirin.
8. Divê medya li gorî madeya 17. a *Peymana Mafên Zarokan* tev bigere.
9. Divê hin rêgezên taybet bên danîn da ku nûçeyên li ser îstîsmara zarokan neyên veşartin û bên nîşandan.
10. Divê ji bo perwerdekirina xebatkarên medyayê, di warê mafên zarokan de hin materyal bên çêkirin.
11. Divê komên çavdêr ên medyayê bên sazkirin.
12. Divê xizmetguzarî hebe ji bo nûçegihanên mafên zarokan.

Li gorî van rêzikan û girîngiya vî warî ji bo zarokan, me jî hewce dît ku em di kurdî de heya niha ji bo zarokan çi hatiye kirin di vê gotarê de raxin ber çavan. Weku me di serî de jî qal kiriye, bi geşedan û pêşketina teknolojiyê ve zarok jî ketin navenda jiyanê û gelek cure amûrên medya û çapemeniyê ji bo wan hatin amadekirin. Di vê xebatê de em ê wan amûrên ku me li jor di beşa destpêkê de hejmartine, hemû ranexin ber çavan. Bi tenê

kovar, rojname, televîzyon û bernameyên televîzyonan ên ji bo zarokan hatine amadekirin, bidin nasandin. Lewra amûrên din hem di kurdî de pir lawaz in hem jî dibe ku mijar zêde berbelav bibe ku ev jî ji sînorê gotarekê bibore.

Herwiha me xebata xwe di pênc binbeşan de belav kir. Çimkî li gorî jiyana kurdan a li pênc parçeyan, xebatên ku hatine kirin jî parçe bûne. Ya herî baş wisa bû ku em jî di vê xebatê de rêbazeke bi vî rengî bişopînin û van xebatan di navbera serdema dawî ya Osmanî û Komara Tirkiyeyê, Ewropayê, Iraq û Herêma Kurdistanê, Îranê û Sûriyê de parve bikin.

## 2. Seyra Geşedanê û Dîrokçeya Medya û Çapemeniya Zarokan A Kurdî

### 2.1.Xebatên ku li Tirkiyeyê Hatine Kirin

Medyaya kurdî di sala 1898an de bi rojnameya Kurdistanê dest pê kir ku di nav bîst salên dawî yên dewleta Osmanî de heya ku dawî lê hat, bi taybetî li navenda wê demê; li Stenbolê çend kovar û rojnameyên din ên kurdî jî weşiyan. Ev kovar û rojname zêdetir bi alîkariya komeleyan di warê edebiyat, huner û zanistê de dihatin amadekirin. Di nav van kovar û rojnameyan de bi taybetî yên ku ji bo zarokan derketibin, tunene. Lêbelê der barê terbiye û pedagojiya perwerdeyê de ji bo dayik, bavik û mamosteyan hin nivîs hatine weşandin. Ji bo mînak di sala 1913an de di *Rojî Kurd* hejmara yekem de bi navê “Mindal Bo Çî Zû Fêrî Xundin Nabe” bi soranî ji aliyê *Silêmanî ‘Ebdulkerîm* ve der barê pedagojiya perwerdeyê de nivîsek hatiye nivîsîn. (Koma Xebatên Kurdolojiyê 2013: 116) Dîsa di sala 1919an de di kovara *Kurdistan*ê de helbesteke bi navê “Delaliya Zarowan” ji aliyê kesekî bi navê *Zîno* ve ji bo zarokan hatiye nivîsandin û ev helbest di sala 1932yan de di kovara *Hawar*ê de li ser navê *Emîn Elî Bedirxan* hatiye weşandin ku di kurdî de wek yekem helbesta ji bo zarokan tê hesibandin. (Mistefa 2004: 27)

Piştî ku Komara Tirkiyeyê ava bû û heya salên 90î weşanên kurdî di nav sînorên Tirkiyê de pir lawaz ketin, çend weşanên ku hatin kirin jî ji aliyê ziman ve xwerû ne kurdî bûn, heke bi kurdîbûna jî ji aliyê çapbûna xwe ve piraniya wan nefermî bûn. Naveroka weşanên vê serdemê zêdetir polîtîk bûn. Ji bo zarokan jî di nav vê serdemê de bi zimanê kurdî mirov rastî weşanekê nayê. Her çiqas di wê serdemê de li cîhanê ji bo zarokan şoreş û înqilabên pir girîng çêbûbin û ji bo zarokan edebiyateke xweser a ku zarok bixwe di navendê de be, hatibe sazkirin û pêl bi pêl belav bûbe jî, ji ber rewşa kurdan a li Tirkiyê û qedexebûna ziman û nebûna xwendin û perwerdeya bi zimanê kurdî, tu berhem nehatine nivîsîn û bûye sedem ku ev alî jî beyar û bêber bimîne.

Li Tirkiyeyê cara ewil bi awayekî fermî li ser bingeheke qanûnî di sala 1991ê de bi rakirina qanûna 2932. êdî ji bilî zimanê tirkî axaftin, gotina kilaman, derxistina qasetan û çêkirina plakan pêkan bûye, lê ev dîsa jî bi sînor maye. (Baluken û Buldan 2013) Piştî vê 10 sal şûnde di madeyên 26 û 28an de jî hin guherîn pêk hatine û bi vî hawî di televizyona dewletê de ji bo demeke sînorkirî cih ji weşana zimanên din re jî hatiye terxankirin. Du sal piştî vê ev made, careke din hatiye guherandin, heqê weşana bi zimanekî din bo sazûmanên taybet jî hatiye dayîn. (Yeğen 2009: 10-11) Piştî van guherînên qanûnî weşanên zimanê kurdî bi awayekî fermî careke din derketin piyaseyê û heya roja îro di gelek babet û mijaran de weşan hatin kirin û weşanên zarokan jî pareke berbiçav derkete

*JOSR* Nisan-2017 Cilt:9 Sayı:1 (17) (s. 107-132) *JOSR* April-2017 Volume:9 Issue:1 (17)

holê. Piştî vê danasîna bi giştî ya li ser rewşa çepemenî û medyaya kurdî ya serdema dawiya Osmanî û herwiha li Komara Tirkiyê, em ê qala xebatên kovar, belavok, televîzyon û bernameyên zarokan ên li Tirkiyê bikin.

### 2.1.1. Kovarên Zarokan

1. **Nûbihar (1992-…[1]):** Ev kovareke çandî, hunerî û edebî ye û ne bi taybetî kovareke ji bo zarokan e. Di serî de bi navê "Zarokname" wek çend rûpelên dawiya kovarê ji bo zarokan veqetandin û ev beş piştre bi navê "Zarokistan" û herî dawî jî bi navê "Nûbihara Biçûkan" weşiya û bi tevahî 112 hejmar jê derçûn û dawî lê hat. Kesê ku beşa Zarokname amade dikir *Xelîl Amed* bû. Beşa Zarokistan ji aliyê *Sabah Kara* û beşa Nûbihara Biçûkan jî ji aliyê *Rojbîn Özkan* ve hatine amadekirin. Xwediyê kovarê *Süleyman Çevik* e. Kovar di serî de mehane weşiyabe jî piştre periyoda weşanê bûye sê mehan carekê an jî demsalî. Weşana kovarê heya niha jî berdewam e û bi tevahî li ser hev 137 hejmar li Stenbolê çap bûye.
2. **Dergûş (2003):** Ji aliyê weşanxaneya *Warê* ve hatiye weşandin. Pêşî wek paşkoyeke kovara Warê derketiye. Her çiqas xwestibin wek kovareke zarokan a serbixwe bê amadekirin jî bi tenê 2 hejmar jê weşiyane. Kesên ku zêdetir pê re betilîne *Seîd Veroj* û *Remezan Pertev* in.
3. **Şemamok (2005-2010):** Di sala 2005an de bi gerînendetiya Şaredariya Sûrê ya Diyarbekirê hatiye weşandin. Ev kovar bi zimanê tirkî û kurdî heya sala 2010an li ser hev 7 hejmar weşiyaye. Edîtorên vê kovarê *Sîdar Jîr* û *Rizo Xerzî* ne.
4. **Dergûş (2008):** Di sala 2008an de ji aliyê Şaredariya Bajarê Nû ya Diyarbekirê ve hatiye weşandin. Bi tenê hejmarek derçûye û edîtoriya wê jî *Sîdar Jîr* kiriye.
5. **Agirê Tûtê (2011):** Di sala 2011an de demsala biharê li Diyarbekirê ji aliyê Kurdî-Derê ve hatiye amadekirin û weşandin. Tenê hejmarek çap bûye. Ji kovarê zêdetir wek Bultena Kurdî-Derê hatiye amadekirin.
6. **Zarokên Rojê (2011):** Dîsa wek Bultena Kurdî-Derê di sala 2011an de di demsala havînê de hejmara yekem weşiyaye. Sêmehane li ser hev bi temamî 4 hejmar weşiyaye.
7. **Perperok (2012-2013):** Ji aliyê weşanxaneya *Ar* ve hatiye weşandin û bi temamî 2 hejmar hatiye çapkirin. Di payîza 2012an de hejmara yekem û di bihara 2013an de jî hejmara duyem çap bûye. Li Stenbolê ji aliyê lijneyekê ve hatiye amadekirin. Kesên di vê lijneyê de ne: *Cüneyt Kulaz*, *Hasan Aslan*, *İdris Benek*, *Fêrgîn Melîk Aykoç*, *Xunav Altun* û *Mevlüt Aykoç* in.
8. **Bûka Baranê (2013-2015):** Xwedîyê kovarê komeleyeke li Stenbolê ya bi navê Komel-Kurd e. Di bihara 2013an de hejmara yekem weşiyaye û di zivistana 2015an de jî hejmara pêncem weşiyaye. Bi tevahî li ser hev 5 hejmar derçûne û edîtora kovarê *Sewîm Qoserî* ye. Kesên ku di nav lijneya amadekar a vê kovarê de cih girtine, *Ayşegul*

[1] Ev nîşana sê xal tê wê wateyê ku ev weşan hêj berdewam e.

*JOSR* Nisan-2017 Cilt:9 Sayı:1 (17) (s. 107-132) *JOSR* April-2017 Volume:9 Issue:1 (17)

*Çelebî*, *Nûriye Çakar*, *Sewîm Qoserî* û *Kenanê Nado* ne. Xêzên vê kovarê ji aliyê *Qerbelek*, *Zîşan Ozeke*, *Sewîm Qoserî* ve hatine amadekirin.

**9. Sîm (1988-?[2]):** Di zindana bajarê Rihayê de di sala 1988an de derçûye. Çend hejmar jê çapbûne nayê zanîn. Ev kovar veşartî û nefermî weşiyaye.

**10. Zarokê Pêşeng (1991):** Di sala 1991ê de di zindana bajarê Aydınê de bi zimanê tirkî weşiyaye. Çend hejmar jê derçûne nayê zanîn ku ev kovar jî veşartî û nefermî weşiyaye.

**11. Dîlan (1991-?):** Ev kovar dewama kovara Zarokê Pêşeng e ku navê xwe guhertiye kiriye Dîlan. Ev kovar di heman zindanê de bi zimanê kurdî di sala 1991ê de derçûye. Çend hejmar jê derçûne nayê zanîn ku ev kovar dîsa veşartî û nefermî weşiyaye.

**12. Dengê Şagirdan (1991):** Di sala 1991an de li bakurê Kurdistanê weşiyaye. Li gorî ku Raûf Hesen dibêje nayê zanîn ka ev kovarçend hejmar û li kîjan bajarê weşiyaye. (Hesen 2015)

### 2.1.2.Weşanên Televîzyonan û Televîzyonên Taybet ên Ji Bo Zarokan

**1. TRT 6/Kurdî (2009/…):** Televîzyona fermî ya dewleta Tirkiyê ye ku 24 saet li ser hev bi zimanê kurdî weşanê dike. Lêbelê ne televîzyoneke bi taybetî ji bo zarokan e. Her çiqas li beramberî weşanên din pir kêm be jî hin bername ji bo zarokan tên weşandin. Ev bername zêdetir wergerên ji zimanê tirkî û dûblaj in. Em dikarin çend ji van bernameyan li vir bidin nasîn:

- **Mîmocan Li Her Derê:** Heya niha bi temamî 346 beş hatiye weşandin û maweya li ser ekranê ya her beşê 20 deqîqe/kêlîk in. Ji tirkî bo kurdî hatiye wergerandin û bidengkirin.
- **Lezgîn û Nazdar:** Ev rêzebername bi temamî 40 beş in ku ji tirkî bo kurdî hatiye wergerandin û bidengkirin. Maweya weşanê ya li ser ekranê ji bo her beşê 10 kêlîk in.
- **Şirînok:** Ev bername bi kurdî hatiye amadekirin. Heya niha 196 beş hatiye weşandin û maweya weşanê ya li ser ekranê ji bo her beşê 30 kêlîk in. Ev bernameyeke kêf û şahiyê ye ku ji aliyê pêşkeşvanek an jî du pêşkeşvanan tê pêşkêşkirin. Herwiha di vê bernameyê de zarok jî beşdar dibin. Naveroka bernameyê lîstik, pêşbazî, xwendina çîrokan û perwerde ye. Pêşkeşvana vê bernameyê xanimeke bi navê *Nalîn Teymûr* e.

**2. Dunya TV (2010-2015):** Li bajarê Entabê hat avakirin û televîzyoneke taybet bû ku bi kurdî rojê 24 saetan weşanê dikir. Ev televîzyon jî xisûsî ji bo zarokan nebû. Lê di nav 5 salan de ji bo zarokan rêzefîlma *Caillou* bi kurdî hat weşandin. Karekterê sereke yê vê rêzefîlmê kurekî li dor 4 salî yê bi navê *Caillou* ye ku tê de bi rêya reftar û macerayên wî perwerdeya zarokan tê kirin û zarokan amadeyê jiyanê dikin. *Caillou* ji berhema nivîskar *Christine L'Heureux* û xêzevan *Hélène Desputaux* ji bo televîzyonê wek rêzefîlm hatiye veguhastin ku zimanê wê yê resen fransî ye û li Kanadayê hatiye çêkirin.

**3. Zarok TV (2015-…):** Li Tirkiyê li ser satelayta *Türksat*ê televîzyona yekem e ku bi taybetî ji bo zarokan rojê 24 saet bi sê zaravayên kurdî (kurmancî, kirmanckî û soranî) weşanê dike. Di sala 2015an de ava bû û weşana wê heya niha

[2] Cihên ku lê pirsnîşan hatine danîn tê wê wateyê ku me vê dîrokê peyda nekiriye.

*JOSR* Nisan-2017 Cilt:9 Sayı:1 (17) (s. 107-132) *JOSR* April-2017 Volume:9 Issue:1 (17)

berdewam e. Ji aliyê werger, dûblaj (bidengkirin) bikaranîna ziman ve televîzyoneke serkeftî ye. *Behçet Sevim* xwedîyê îmtîyazê yê televîzyonê ye. *Dilek Demiral* koordînatoriya giştî ya televîzyonê bi rê ve dibe û *Mazlûm Doxan* jî şêwirmendiya weşanê ya televîzyonê dike. Her çiqas vê dawiyê çend bernameyên resen û xwemal hebin jî kêmasiyên vê televîzyonê zêdetir, neafirandina karekterên resen ên kurdî ne û herwiha ji bo zarokên pêşdibistanê kêmbûna bernameyên perwerdeyê ne. Navenda televîzyonê li Diyarbekirê ye. Çend ji bernameyên ku di vê televîzyonê de tên weşandin, ev in:[3]

**3.a. Bernameyên Werger û Dûblajkirî**

- **Dema Macerabaziyê:** Ev bernameya ku ji 52 beşan pêk tê li ser têkiliya hevaltiyê û hesta parvekirinê hûr dibe. *Jake* yek ji lehengên fîlmê ye ku ew kûçikekî pîr û zana ye û lehengekî din jî kurikekî zarşêrîn ê bi navê *Finn* e.
- **Rêzikên Angelo:** Ev rêzik ji 78 beşan pêk tê. Naveroka vê der barê macerayên zarokekî bi navê *Angelo* û hevalên wî de ne.
- **Mêşhingiv Maya:** Ev rêzik ji 102 beşan pêk tê ku li ser karekterên dijber ava dibe. Di vê rêzikê de karektereke bi navê *Maya* heye ku ew şûm û nehs e û li dijberê wê karakterekî bi navê *Willy* heye ku ew jî tirsonek û bi fikar e. Ev bername der barê macerayên van her du karakteran de ye. Herwiha karakterekî bi navê *Philp* heye ku rola wî jî xelasker e. Ev bername bi tameke çîrokî dixwaze hezkirina ajelan bixe dilê zarokan û herwiha bi karakterên li dij hev bala zarokan zêdetir kûr û hûr bike.
- **Beqên Şopger:** Ev bernameya ku ji 26 beşan pêk tê, zarokan ji cîhana rasteqîn dibe alema fantastîk. Macerayên heşt beqan di daristaneke bisêhr de tê vegotin ku bi vê yekê dixwaze sînorên xeyalên zarokan fireh bike.
- **Daristana Gulbihar:** Ev rêzik jî ji 52 beşan pêk tê û der barê têkiliyên hevaltiyê de ye.
- **Taqîgeha Dexter:** Ev bername ji 77 beşan pêk tê û di vê bernameyê de aksîyon û honakên zanistî cih digirin û tê de qala serboriyên zanyarekî biçûk ê bi navê *Dexter* tê kirin.
- **Mala Fosteran:** Ev rêzika ku ji 79 beşan pêk tê li ser hevalên xeyalî hatiye sêwirandin. Ev bername dê zêdetir bala zarokên di serdema egosentrîk de bikêşe.
- **Gumball:** Ev rêzik ji 92 beşan pêk tê û qala alema bikelecan a *Gumball* dike ku ew pisîkeke dozdehsalî ye.
- **Stêrka Laurayê:** Li ser çîrokeke sêhrîn û razdar tê sêwirandin û bi tevahî ji 52 beşan pêk tê. Ezmanê ku her gav di xeyalên zarokan de ye îcar bûye qada wan.
- **Çolistanên Oscar:** Ji 78 beşan pêk tê. Serboriyên lehengê bi navê *Oscar* tê vegotin. Ev bername zêdetir jiyana li qadeke cuda yanî jiyana çolê nîşanî zarokan dide.
- **Pocahontas:** Qala çermesoran dike û ji 26 beşan pêk tê.
- **Şînok:** Navê resen ê vê bernameyê *The Smurfs* e ku qala jiyana komunal dike. Ev bername rexneyek e li ser pergala kapîtalîst. Karakterên ji hev cuda yên vê bernameyê û senaryoya wê kêfa zarokan tîne.

[3] Koordînatora giştî ya televîzyonê Dilek Demiral, hin ji van agahiyan bi me re parve kir.

- **Sifinc Bob:** Ev bername ji karakterên grotesk pêk hatiye û qala serboriyên li giravekê dike. Ji 100 beşan pêk tê.

Ji bilî van rêzefîlman gelek rêzefîlm û fîlmên sînemayî jî hene ku hin ji wan ev in: Cedric, Nexweşxaneya Serê Gir, Pablo: Roviyê Sor ê Piçûk, Mig Dibêje, Louie, Baxçeyê Ajelan, Corneil&Bernie, Bajarokê Mirîşkan, Hespikê Avê, Trotro, Tintin, Yakari, Garfield, Mala Periyan, Darbirên Hêrsok, Road Runner, Tom û Jerry, Billy&Buddy, Lmn's, Pînokyo, Raindrop, Moby Dick, Macerayên Gulliver, Çîroka Bêdawî…

**3.b. Bernameyên Resen ên Televîzyonê**

- **Dora Te:** Di vê bernameyê de hin pirs ji zarokan tê pirsîn û zarok jî bersiv didin van pirsan. Heya niha gelek beşên vê bernameyê hatine weşandin.
- **Hebû Tunebû:** Di vê bernameyê de çîrokên gelêrî tên vegotin û bi rêya van çîrokan, çanda kurdî bi zarokan tê nasandin. Bi temamî ji 47 beşan pêk tê.
- **Hunerên Destan:** Ji 50 beşan pêk tê û ji bo pêşketina reftarên psîkomotor ên zarokan, bernameyeke fêrkar e.
- **Zarokistan:** Qala deverên dîrokî yên Kurdistanê tê kirin û bi tevahî ji 30 beşan pêk tê.
- **Fêrgeh:** Ji 51 beşan pêk tê. Ji bo şirînkirina zimanê dayîkê û hişyariya girîngiya ziman bernameyeke serkeftî ye.
- **Kenkenok:** Di vê bernameyê de serboriyên mirovan, zarokan, ajelan yanî her çi serboriyeke awarte û biken hebe, bi awayekî vîdeoklîb tê weşandin. *Erhan Yıldız* derhêneriya vê bernameyê dike û *Gulfidan Tay Yıldız* jî karê edîtorî û pêşkeşvaniyê bi rê ve dibe.
- **Nikil û Gevez:** Du karakterên bi navê *Nikil* û *Gevez* di vê bernameyê de li ser mamik û tiştanokên kurdî dikevin sohbet, lîstik û pêşbaziyê. *Nikil* dîkilek e ku kone, nehs û netebitî ye û mamikan ji *Gevez* dipirse ku ew jî di şûna gayekî tiral de rola xwe dilîze. Senaryoya vê bernameyê ji aliyê *Qemer Erdoğan* ve tê nivîsandin û derhênêrîya wê jî *Edrîs Samanî* dike.
- **Landik:** Di vê bernameyê de hin çîrokên kurdî bi deng tên xwendin û herwiha li gorî senaryoya çîrokê bi anîmasyonê jî tê nîşandan. Çîroka bi navê *Dîkil Axa* ji aliyê *Mizgîn Tahir* ve hatiye xwendin. Çîroka bi navê *Hîkayetê Selem* bi zaravayê soranî ji aliyê *Îlham Hamêdî* ve hatiye xwendin.

Ji bilî van bernameyan, hin vîdeoklîb û stranên ku hatine çêkirin jî hene. Di vîdeoklîban de hin zarok dilîzin ku ew bûne leheng û lîstikvanên van klîban. Di van klîban de du tişt pir serkeftî ne yek jê lîstina zarokan e ku rola xwe baş dilîzin. A din jî mûzîk e ku ji bo van stranan tê amadekirin û ji bo zarokan pir balkêş û bi tevger e. Mûzîkên van stranan ji aliyê *Konservatûara Aram Tîgran*, *Koroya Dibistana Ferzad Kemenger*, *Şubadap Çocuk/Zarokên Şubadap* ve hatine çêkirin. Nivîsên van stranan gelek ji wan resen in û zêdetir jî ji aliyê *Aram Gernas* ve hatine nivîsîn. Ji bilî *Gernas* kesên wek *Hisênê Emîn*, *Pîremêrd*, *Qemer Erdoxan*, *Halis Yurtsever*, *Xweşnav*, *Samya Özbay Korhan*, *Şêrko Kanîwar* û *Alî Doğan Gönültaş* jî xwediyê gotinên hin ji van strananan in

*JOSR* Nisan-2017 Cilt:9 Sayı:1 (17) (s. 107-132) *JOSR* April-2017 Volume:9 Issue:1 (17)

ku navên van stranan ev in: Marşa Tîpan, Trafîk, Anatomiya Laş, Newroza Hatawa, Silav, Zarok Tv, Newroz, Dinyayê Me, Ha Lî Lî, Rojek, Baran, Veşartok, Dîlana Biratî, Banga Zarokan, Rojbûn, Here Here!, Heywanên Me, Mamoste, Hevaltî, Awa Warê Deşte, Şit Doşena, Roj, Usar, Hamnan, Zimistan, Payîz, Çi Xweş e, Kîvroşkê, Trên Çû. Di nav van stranan de di jenerîka "Marşa Tîpan" de ji bo gotinê, navê *Aram Gernas* hatiye nivîsîn ku ev yek şaş e. Çimkî ev helbest ji aliyê *Hisênê Emîn* ve hatiye nivîsandin û di sala 1944an de di kovara Ronahiyê hejmara 25an de weşiyaye. (Ronahî 1944: 15) Wekî din di jenerîka strana "Newroz Hatawa" de ji bo xwediyê gotinê kesek nehatiye nivîsîn ku ev jî wek kêmasiyek e û herwiha helbest jî ya *Pîremêrd* e. (Hawar, 2007: 109) Hin stran û klîb jî ji aliyê komeke bi navê *Şubadap Çocuk/Zarokên Şûbadap* ve hatine amadekirin û ji aliyê Zarok Tv ve ji zimanê tirkî bo kurdî hatine adaptekirin. *Sennur Sezer, Eşref Karadağ, Nermin Biter, Murat Biter, İlkay Tanyer, Bengü Laçin* û *Emek Terzi* di vê komê de xwediyê gotinên hin stranan in ku ev stran: Masiyê Lal, Strana Dîno, Kaxiz û Pênûs, Zanyar Beg, Ezman Ê Kê Ye?, Darjiyan in.

Zarok Tv ji aliyê naveroka xwe ve televîzyoneke pir dewlemend e ku mirov dikare bibêje hêdî hêdî xwe digihîne standardên cîhanê di vî warî de. Lewra gelek bernameyên ku me li vir nedan nasîn jî hene. Herwiha dema mirov ji destpêka weşana wê ve wê bişopîne, mirov dê bi rehetî bibîne ku pêşketineke mezin tê de çêbûye. Mesela di serî de ji aliyê weşanên xwemalî ve pir kêm bername tê de diweşiyan. Lê îroroj dema ku mirov vê televîzyonê bi televîzyonên din ên zarokan ên kurdî re berawird dike, mirov dibîne ku di warê bernameyên xwemalî de ferqeke mezin a Zarok Tv û yên din heye. Bi taybetî jî di bernameyên anîmasyon û bernameyên xwedî karakterên ferazî de ev ferq zêdetir dixuye.

### 2.2. Xebatên ku li Ewropayê Hatine Kirin

Xebatên kurdî li Ewropayê zêdetir piştî salên 1970yan pêş ketine û belav bûne. Her çiqas di salên 1950 û 60an de çend kovarên kurdî derketibin jî berbelavbûna kovargeriya li Ewropayê di salên 70 û 80yan de dest pê dike. (Polat 1999: 8-9) Piştî ku penaberî û koça sîyasî zêdetir dibe, karên rewşenbîrî jî her pêş dikeve. Xebatên zarokan jî piştî salên 1980yan çê dibin ku hin ji van li jêr hatine nasandin.

#### 2.2.1. Kovarên Zarokan

1. **Kulîlk (1980-1997):** Di nav 17 salan de bi tevahî 51 hejmar weşiyaye. Li Swêdê bajarê Stockholmê bi hevkariya Mala Kultura Kurdî, Weşanên Jîna Nû û Komela Çanda Karkerên Kurdistanê ev kovar hatiye amadekirin. *Reşo Zîlan* yek ji amadekarên vê kovarê bû.
2. **Hêvî (1981-1984):** Li Swêdê li bajarê Stockholmê weşiyaye. Di navbera salên 1981 û 1984an de bi tevahî 15 hejmar jê derçûne.
3. **Hêlîn (Sibat 1982-Hezîran 1985):** Li Swêdê li bajarê Stockholmê ji aliyê Yekîtiya Karkerên Demokrat ên Kurdistanê ve bi tevahî 14 hejmar hatiye weşandin. Kovareke demsalî û wênedar a zarokan bû. Lijneya nivîskarên kovarê ji *Mahmûd Lewendî* û *H. Mizgîn* pêk dihat.
4. **Heval (1995-?):** Li Swêdê li bajarê Stockholmê weşiyaye. Ji aliyê kê ve hatiye amadekirin û çend hejmar weşiyaye nayê zanîn.

ISSN: 1308-9633

*JOSR* Nisan-2017 Cilt:9 Sayı:1 (17) (s. 107-132) *JOSR* April-2017 Volume:9 Issue:1 (17)

5. **Hêviya Me (1997-?):** Li Swêdê li bajarê Stockholmê weşiyaye. Ji aliyê kê ve hatiye amadekirin û çend hejmar weşiyaye nayê zanîn.

6. **Kurdîlekan گۆڤاری کوردیلەکان (21.3.2007-…):** Ev kovar sê mehan carekê li Norveçê weşiyaye û heya niha 5 hejmar jê derçûne. Serperiştê kovarê *Reza Shiwan* e. Ji ber nebûna kadroya xêzevanan, vê gavê weşana kovarê rawestaye.

7. **Koçer (1988-1992):** Li Swêdê di sala 1988an de çap bûye. Kovareke demsalî ya taybet a zarok û ciwanan e ku bi tîpên erebî û zaravayê soranî hatiye amadekirin. Bi tevahî 12 hejmar jê derçûne û ji aliyê *Asî Rebatî* ve hatiye amadekirin û belavkirin.

**2.2.2. Weşanên Televîzyonan**

1. **Med Tv (1995-…):** Ev televîzyon bi navên cuda yên wek Medya, Roj, Stêrk li Belçîkayê weşana xwe domandiye û hê jî didome. Ev ne telêvîzyoneke taybet ji bo zarokan e. Lêbelê di nav weşana rojane de bi taybetî di serdema Med û Medya Tv de ji bo zarokan bername û fîlm dihatin weşandin:

- Bernameyên ji bo fêrkarî û perwerdeya zarokan bi navê “Baxçê Zarokan”, “Rojbaş Mamoste”, “Dibistana Kurdî”, “Xwendingeha Kurdî” ji aliyê *Amed Mekî Tîgrîs* ve hatine amadekirin.
- **Hindik lê Rindik:** Bernameyeke kenê, qerf û henekan e û pêşkeşvaniya wê *Barzan Şahswar* dikir.
- **Wallace & Grommit:** Ev her du karakter ji aliyê *Aardman Animations* ve hatin çêkirin. *Wallace* mûcîdek e ku pir mijûl e. *Gromit* jî kûçikê wî yê sadiq e. Ev fîlm bi dûblaja kurmancî hat weşandin.
- **Les Tres Bessones:** Zimanê resen ê vê fîlmê katalanî ye ku çîroka wê ji aliyê *A. Gaudi* ve hatiye nivîsandin. Serboriyên keçên sêyek in ku bi tevahî ji 104 beşan pêk tê. Ev rêzefîlm jî bi dûblaja kurmancî hatiye weşandin.

2. **Kurd 1 (2009-2013):** Ev televîzyon ji aliyê *Enstîtuya Kurdî ya Parîsê* ve hatiye avakirin ku ne televîzyoneke bi taybet ji bo zarokan e. Lêbelê di nav weşana wê ya rojane de ji bo zarokan hin bername û fîlm hatine amadekirin û weşandin. Bername û fîlmên dûblaj ên ji bo zarokan, ev in:

- **Dersa Kurdî:** Ev bername ji aliyê *Îbrahim Seydo Aydoğan* ve hatiye amadekirin. Armanca vê bernameyê fêrkirina zimanê kurdî ji bo zarokan e. Her beşeke vê bernameyê 15 kêlîk li ser weşanê dima û bi tevahî 60 beş jê hatiye weşandin.
- **Keskesor:** Du pêşkeşvanên bi navê *Evîn* û *Îssa* vê bernameyê pêşkeş kirine ku tê de lîstik, stran, vegotina çîrokan û fîlmên zarokan ên bi navê *Orson&Olivia* û *Captain Cousteau* hatine nîşandan.
- **Fantomette:** Ev karakterê ku ji aliyê *Georges Chaulet* ve hatiye afirandin wek fîlmên zarokan jî hatiye amadekirin. Bi dûblaja kurmancî wek 27 beş hatiye weşandin.
- **Trotro:** Anîmasyoneke fransî ye û *Trotro* navê karekterê fîlmê ye ku ew kerekî biçûk e. Ev fîlm bi tevahî ji 78 beşan pêk tê. Lêbelê wek dûblaja kurmancî 45 beşên wê hatine weşandin.

- **Cedric:** Ev rêzefîlmeke zarokan e ku ji aliyê karîkaturîstê Belçîkayî *Raoul Cauvin* ve hatiye nivîsîn û ji aliyê xêzevan *Laudec* ve jî hatiye xêzkirin. Cara pêşî li Fransayê hatiye weşandin û bi tevahî ji 156 beşan pêk tê û wek dûblaja kurmancî jî di Kurd 1 Tv de hatiye weşandin.

### 2.3. Xebatên ku li Iraqê û Herêma Kurdistanê Hatine Kirin

Di sala 1918an de dewleteke bi navê Iraqê di bin kontrola Îngilizan de hat damezirandin. Piştî vê qismekî kurdan di bin desthilata Tirkiyê de man qismekî wan jî ketin bin desthilata mêtinger a Iraqê. Ji ber vê li Iraqa nû xebatên kurdî yên rewşenbîrî û çapxane û çapemeniya kurdî cara ewil di sala 1920an de li Silêmanîyê di bin kontrola desthilata mêtinger a Îngiliz de dest pê kir. Xebatên kurdî carinan di bin kontrola hukûmeta navendî de dimeşiya û carinan jî ji aliyê birêvebiriyên xweser, otonom û herî dawî federal ên kurdan ve dihatin pêkanîn. Ji ber guherîna desthilatan cih û warên xebatan jî wek Bexda, Mûsil, Silêmanî, Kerkûk, Hewlêr, Duhok diguherîn. (Hassanpour 2005: 277-288) Ji destpêkê heya serdema otonomiya 1970yan li Iraqê ji bo zarokan bi kurdî çepemeniyeke taybet tunebû. Di vê navberê de nivîsên perwerde û pedagojîk ji bo zarokan di kovar û rojnameyên mîna *Zarî Kirmancî*, *Gelawêj*, *Rojî Kurdistan* û hwd. de parçe parçe dihatin weşandin. Di nav van berheman de ya herî berbiçav ku ji bo zarokan gelek helbest, çîrok û nivîsên wekî din weşandine, kovara *Gelawêj*ê ye ku hejmara yekem di sala 1940an de derçûye. Di vê kovarê de kesên wek *Zîwer*, *Bêkes*, *Şakir Fetah*, *Eladîn Secadî* û *Goran* ji bo zarokan helbest û çîrokên cûrbicûr nivîsîne. (Berzincî 2010: 43-60) Ji bo zarokan wek kovareke taybet li Iraqê cara yekem di sala 1972yan de bi navê *Estêre* û bi tevahî sê hejmar li Bexdayê diweşe. (Berzincî 2010: 34-40) Piştî vê kovarê dîsa navbereke dirêj dikeve nav çapemeniya kurdî ya zarokan li Iraqê û heya ku li wir Herêma Kurdistanê bi awayekî federal ava dibe, ji nû ve pêla çapemeniya zarokan geş dibe û heya roja îro bi dehan kovarên taybet ên zarokan derçûne û herwiha televîzyonên taybet ji bo zarokan ava bûne ku em ê li jêr bi kurtî behsa van bikin.[4]

#### 2.3.1. Kovarên Zarokan

1. **Estêre گۆڤاری ئەستێرە (Gulan 1972-18.3.1974):** Ji aliyê *Komaleya Rewşenbîrî Kurdî* ve wek paşkoya kovara *Rojî Kurdistan* hatiye weşandin û yekemîn kovara zarokan a li başûrê Kurdistanê tê hesibandin. Li Silêmanî bi tevahî 3 hejmar çap bûye. Hejmara yekem bi bergên xwe ve 28 rûpel û hejmara duyem û sêyem jî wek 32 rûpel li Silêmanî li çapxaneya *Kakeyî Felah* hatine çapkirin. Amadekarên vê kovarê *Ehmed Seyîd Elî Berzincî* û *Lale Ebde* ne. Serperiştê kovarê *Salih Yusif* e û derhênerê hunerî jî *Lale Ebde* ye. Çend kesên ku wek nivîskar tê de nivîsîne jî ev kes in: *Rizgar Şewqî*, *Ehmed Elî Berzincî*, *Ebdulkerîm Mehmûd Şêxanî*, *Sidîq Mehmûd Berzincî*, *Kakeyî Felah*, *Şakir Fetah*, *Elî Emîn*, *Osman Hewramî*, *Ehmed Fehmî*, *Remzî Qezaz*, *Ebdûllah Peşêw*, *Bêkes* û *Salih Yusif*. Ev kovar di Gulana 1975an de careke din ji aliyê *Dr. Îhsan Fûad* û *Cemal*

[4] Ji bo agahiyên berfireh der barê kovarên zarokan ên Iraqê û Herêma Kurdistanê binêrin: Mistefa, İdrîs Ebdulla. (2004) "Rojnamegerîy Mindalan Bi Zimanê Kurdî", Wezaretî Rewşenbîrî, Hewlêr. Herwiha li vê gotarê jî binêrin: Shiwan, Reza. (2015) "Rageyandinî Mindalan (Beşî Duwem); Govarî Kurdiyekanî Mindalan" http://www.hawpshti.com/ku/?p=4599 (Dema jêgirtinê: 11.01.2017)

e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi
*Journal of Oriental Scıentific Research (JOSR)* www.esarkiyat.com ISSN: 1308-9633

*JOSR* Nisan-2017 Cilt:9 Sayı:1 (17) (s. 107-132) *JOSR* April-2017 Volume:9 Issue:1 (17)

*Xeznedar* ve wek paşkoya kovara *Rojî Kurdistan* sê hejmarên din jî diweşe û di sala 1982yan de wek dewama vê kovarê hejmareke din jî diweşe.

2. **Govarî Estêre (1992):** Bi vî navî ev kovar bi lijneyeke nû careke din li Silêmanî ji aliyê dibistanekê ve tê amadekirin û kesên ku bi kovarê re mijûl in *Mamosta Elî Kemal* birêveberiya nivîsan dike û *Mamosta Şewbo Ebdulla* jî wek cîgirê birêvebir kar dike û *Mamosta Ezmir Salih* jî bi karê hunerî re mijûl dibe. *Mamoste Raûf Osman*, *Ebdulla Peşêw*, *Elî Ewnî Şewnem* jî nivîskariya kovarê dikin.

3. **Pepûle گۆڤاری پەپولە (1992-…):** Wek kovareke perwerde û rewşenbîrî ya zarokan ji aliyê *Komaleya Mindalparêzî Kurdistan* ve mehane tê weşandin. Li Silêmanî çap dibe û yek ji wan kovarên zarokan e ku herî zêde belav dibe û her hejmar 2000 heta 5000an çap dibe. Heya niha 228 hejmar jê belav bûne û hê jî berdewam e. Xwediya îmtîyazê ya kovarê *Hêro Îbrahîm Ehmed* e. Serperiştê wê pêşî *Kurmanc Muhemmed Ehmed* bû û piştî hejmara 68an *Yasîn Qadir Zirgwêzî* vî karî girt ser milên xwe.

4. **Pereshêlke گۆڤاری پەڕەسێلکە (1991-?):** Kovareke rewşenbîrî û edebî ya zarokan e ku mehane li Hewlêr û Swêdê derçûye û bi tevahî 9 hejmar jê belav bûne. Kadroya nivîskarên wê ji kesên wek *Mewlûd Îbrahîm*, *Îdrîs Lawe*, *Helgurd Ebdulwehab Cundiyanî* pêk hatiye.

5. **Cigergoşekan گۆڤاری جگەرگۆشەکان (Tebax 1992-…):** Ji aliyê *Komaleya Nûseranî Îslamî Kurdistan* ve hatiye amadekirin û ev kovar di çar qonaxan re derbas bûye. Qonaxa yekem di nav kovara bi navê *Peyamî Rastî* de derçûye û wê çaxê navê wê (*Peyam û Cigergoşekan*) bûye û wek çar rûpelî hatiye amadekirin. Di vê qonaxê de serperiştê wê *Daykî Xelat* bûye û bi tevahî 4 hejmar di vê qonaxê de weşiyaye. Hejmara yekem bi hejmara çardehemîn a kovara *Peyamî Rastî* re derketiye. Di qonaxa duyem de navê vê kovarê bûye *Peyamî Cigergoşekan* û wek paşkoyeke kovara *Peyamî Rastî* bi awayekî diyarî hatiye belavkirin. Di vê qonaxê de jî her hejmara wê heşt rûpel hatiye amadekirin. Di qonaxa sêyem de bi navê *Cigergoşekan* bi tevahî 7 hejmar weşiyaye. Hejmarên vê qonaxê ji hezîrana 1998an heya Kanûna Yekem a sala1998an dewam kiriye. Di vê qonaxê de jî dîsa ji aliyê ofîsa kovara *Peyamî Rastî* ve hatiye amadekirin. Qonaxa çarem qonaxa herî dirêj a vê kovarê ye ku hejmara 42yan hejmara destpêkê ya vê qonaxê ye û heya niha gihiştiye 225 hejmaran. Li Hewlêr û Silêmanî di çend çapxaneyên cuda de çap bûne. Ev kovar jî yek ji wan kovaran e ku herî zêde çap û belav dibe. Tîraja wê li gorî hejmaran di navbera 3000 û 5000an de diguhere. Her çiqas carinan hin kes jê derketibin û dîsa lê vegeriyabin an jî venegerîbin jî desteya nivîskarên vê kovarê ev kes bûne: Sernûser *Ebdulla Necmeddîn Taha* e. Karên hunerî ji aliyê *Reca Muhemed Elî* ve tê kirin û karê kompîturê jî *Cîhad Omer* girtiye ser milên xwe. Ji bilî van nivîskarên kovarê *Ehmed Qadir Seîd*, *Ebdulxaliq Qeredaxî*, *Beyan Namîq Muhemed*, *Kamêran Heme Kerîm* in.

6. **Heng هەنگ گۆڤاری (1993-…):** Kovareke mehane ya zarokan e ku ji aliyê *Wezareta Perwerdeyê ya Herêma Kurdistanê* ve li Hewlêrê hatiye weşandin. Li gorî lêkolînên li ber destê me, di deh salan de gihiştiye hejmara xwe ya 84an û hê jî berdewam e. Rûpelên hejmarên vê kovarê di gelek hejmaran de ji hev cuda bûne û wek 12, 16, 20, 24, 28, 32 rûpelî ji hev cuda weşiyane. Ji ber ku weşaneke wezaretê ye, xwediyên kovarê bi guherîna wezîr û kadroyên wezaretê guherîne. Lêbelê em dikarin navên çend kesên ku

*JOSR* Nisan-2017 Cilt:9 Sayı:1 (17) (s. 107-132) *JOSR* April-2017 Volume:9 Issue:1 (17)

kedkarên vê kovarê ne li vir nîşan bidin: Mewlûd *Îbrahîm Hesen*, *Heme Salih Ferhadî*, *Husên Elî Welî*, *Muhemd Îsmaîl*, *Felekedîn Kakeyî*, *Yasemîn Muhemed Berzincî*, *Ebdulqadir Elî Merdan*, *Rustem Bacelanî*, *Necat Refîq Hilmî*, *Guler Siyamensûr*, *Kerîm Mistefa Şareza*, *Dara Muhemed Elî* û gelek kesên din di vê kovarê de bi peywirên cuda cih girtine.

**7. Hêlaney Mindallan گۆڤاری هێلانەی منداڵان (19 Tebax 2000-…):** Ev heftenameyeke taybet e ji bo zarokan ku ji aliyê dezgehên rojnameyên bi navê *Birayetî* û *Xebat* ve tê amadekirin ku ev her du rojnameyên rojane bi *Partiya Demokrat a Kurdistanê* ve girêdayîne. Li Hewlêrê hatiye çapkirin. Sê qonaxên weşana vê heftenameyê hene. Di qonaxa yekem de wek rûpelekî bi tevahî 4 hejmar di rûpela dawî ya rojnameya *Birayetî* de weşiyaye. Piştre bûye paşkoyeke serbixwe ya van rojnemeyan û 52 hejmarên din bi 4 rûpelî hatiye amadekirin. Tenê hejmara 50yan 8 rûpel çap bûye. Di qonaxa sêyem de bûye kovareke taybet a zarokan ku dîsa ji aliyê rojnameya *Xebat* ve hatiye belavkirin ku heya niha 237 hejmar jê çap bûne. Ev kovar mehê du hejmar jê derdiçin û sernûserê wê *Seyran Selam Ebdullah* e û xwediyê wê jî *Elî Ebdulla* ye.

**8. Cerîwe گۆڤاری جریوه (1998-1999):** Kovareke mehane ya zarokan e ku li Silêmanî bi tevahî 9 hejmar weşiyaye. Xwediyê îmtîyazê yê kovarê *Cemal Ebdulla* ye û serperiştê wê jî *Tahîr Salih Seîd* e.

**9. Mindallî Serdem گۆڤاری منداڵی سەردەم (2006-…):** Ji aliyê weşanxaneya *Serdem* ve wek kovareke mehane ya zarokan li Silêmanîyê tê weşandin. Heya niha 105 hejmar jê derçûne û hê jî berdewam e. Ji bo zarokên 5 ta 12 salî tê amadekirin. Xwediyê kovarê *Şêrko Bêkes* bû ku xwediyê weşanxaneyê bû jî. Lêbelê di sala 2013an de Şêrko Bêkes wefat kir û piştre navê wî wek serokê fexrî yê kovarê di kovarê de cih girt. Sernûserê kovarê *Helkewt Ebdulla* ye û wênekêş jî *Goran Ehmed* e.

**10. Simore گۆڤاری سمۆره (2010-…):** Kovareke demsalî ya zarokan e ku ji aliyê birêvebiriya *Xaniyê Simore* ve li Silêmanîyê tê weşandin. Xwediyê kovarê birêvebiriya *Xaney Simore* ye û sernûsera kovarê jî *Terîfe Mihemed Ehmed* e.

**11. Mindallanî Bawe Gurgur گۆڤاری منداڵانی باوه گوڕگوڕ (2003-…):** Li Kerkûkê ji aliyê *Saziya Rewşenbîrî Şefeq* ve di sala 2003yan de wek kovareke mehane ya zarokan hetiye weşandin û piştî heft salan weşana xwe bi navê "*Hacîle"* berdewam kir û ev kovar jî mehane derdiçe û hê jî berdewam e. Xwediyê kovarê *Felakedîn Kakeyî* ye û sernûserê wê jî *Yûsif Letîf* e.

**12. Mişke گۆڤاری مشکه (?):** Ji aliyê weşanxaneya *Aras* ve wek kovareke mehane ya zarokan li Hewlêrê hatiye weşandin. Xwediyê kovarê *Bedran Ehmed Hebîb* e û sernûserê wê jî *Emîr Hacî Dawud* e.

**13. Gizingî Biçûkan گۆڤاری گزنگی بچووکان (1985) :** Paşkoya kovara Gizing bû ku ji aliyê *Yekîtiya Nivîskarên Kurd* ve li Kerkûkê bi tevahî 3 hejmar hat weşandin.

**14. Gullekan گۆڤاری گوڵەکان (2006) :** Li qezaya Çemçemalê ji aliyê *Organîzasyona Tevgerên Lawan* hatiye weşandin.

**15. Pêşengî Mindallan گۆڤاری پێشەنگی منداڵان (?) :** Ji aliyê *Rêkxirawî Pêşengî Zarokên Kurdistanê* ve wek kovareke mehane ya zarokan li Hewlêrê hatiye weşandin. Xwediyê kovarê *Tariq Xurşîd* e û sernûserê wê jî *Şêrzad Resûl Feqî* ye.

**16. Colanê جۆلانی گۆڤاری (2013-…):** Li Hewlêrê wek kovareke demsalî ya zarokan tê weşandin ku heya niha gihiştiye hejmara xwe ya 14an. Xwediyê kovarê Mihemed Huseyn Bapîr e û sernûserê kovarê jî Aza Yûsif e.

**17. Rûdawî Mindallan رووداوی منداڵان گۆڤاری (2013 Gulan-…) :** Ji aliyê *Rûdaw Company* ve wek kovareke mehane ya zarokan li Hewlêrê tê weşandin. Sernûserê kovarê *Rehêl Reşîd Ezîz* e.

**18. Jînwar ژینوار گۆڤاری (?) :** Kovareke sêmehane ya zarokan e. Xwediyê kovarê *Şermîn Hemed Reşîd* û sernûserê wê jî *Karwan Reşîd* e.

**19. Sivore سڤۆره گۆڤاری (22.4.1988-…):** Kovareke mehane ya zarokan e ku li Duhokê ji aliyê *Saziya Xanî ya Rewşenbîrî û Ragihandinê* ve tê weşandin. Nivîsên di kovarê de zêdetir bi zaravayê kurmancî ne û kêmek jî bi zaravayê soranî ne û bi du alfebetan erebî û latînî weşiyaye. Heya niha ji 200 hejmarî zêdetir weşiyaye û berdewam e. Yek ji wan kovaran e ku tîraja wê herî zêde ye û vê gavê her hejmarek 3500 heb çap dibin. Li ser hin hejmaran nivîsiye ku li Duhokê di çapxaneya Hawarê de çap bûye. Desteya kedkar û nivîskarên kovarê çend caran guherî ye. Xwediyê îmtîyazê pêşî *Karwan Akreyî* bûye û paşê *Hebîb Keleş* vî karî girtiye ser milên xwe. Di desteya nûseran de kesên wek *Bêrîvan Reşîd*, *Jiyan Mistefa*, *Selam Balayî*, *Mihemed Elî Etroşî*, *Tayîb Deştanî*, *Fehmî Selman*, *Perwîn Ebdulezîz* hene. Herî dawî sernûseriya kovarê *Selam Balayî* dike û di bin îmtîyaza *Saziya Xanî* de ye.

**20. Pêlîstank پێلستانک گۆڤاری (2014-…) :** Kovareke mehane ya zarokan e ku ji aliyê telavîzyona zarokan *Pêlîstank* ve tê weşandin. Bi du zaravayan kurmancî û soranî diweşe û sernûserê kovarê *Meaf Menaf Barzanî* ye.

**21. Kepir کەپر گۆڤاری (2003-2009):** Kovareke mehane ya zarokan e ku li Dûhokê ji aliyê weşanxaneya *Spîrêzê* ve hatiye weşandin. Bi arîkariya du projeyên *Diyakona* derketiye. Nivîsên di kovarê de bi zaravayê kurmancî hatine nivîsîn û bi tevahî 75 hejmar jê derçûne. Xwediyê îmtîyazê yê kovarê *Çinar Elî Mendî* ye. Sernûserê kovarê *Muyed Teyyîb* e û karê hunerî jî ji aliyê *Necmeddîn Bîrî* ve hatiye kirin.

**22. Nêrgiz (1999):** Belavokeke komelayetî û rewşenbîri ya giştî ye û bi taybetî ji bo zarokan derketiye û bi tenê hejmarek jê çap bûye. Li ser hev heşt rûpel e û li Hewlêrê di çapxaneya Jiyan de çap bûye. Xwediyê îmtîyazê yê kovarê *Komeley Mindalparêzî Kurdistan* (KSC) e. Sernûsera belavokê *Necîbe Muhemed Emîn* e.

**23. Nêrgiz (1 Tebax 2003-?):** Belavokeke zarokan e ku ji aliyê *Weşanxaneya Bedirxan* ve hatiye weşandin û li Silêmanîyê di çapxaneya *Tîşk* de çap bûye. Bi bergê xwe ve heşt rûpel bûye. Xwedîyê îmtîyazê û berpirsê kovarê *Hemîd Ebûbekir Ehmed* û karê sernûseriyê jî *Bilind Mistefa* bi rê ve biriye.

**24. Karwanî Mindallan کاروانی منداڵان (1990):** Kovareke taybet bo zarok û ciwanan e û wek paşkoya kovara *Karwan* weşiyaye. Li ser hev 2 hejmar jê derçûne û hejmara yekem bi bergê xwe ve 24 rûpel in û hejmara duyem jî 32 rûpel çap bûye. Ji aliyê *Emîndariyetiya Giştî ya Rewşenbîrî û Lawanî Navçey Otonomîy Kurdistan* li Hewlêrê di çapxaneya *Xwendina Bala* de çap bûye. Sernûserê kovarê *Hîkmet Hacî Selîm* e û karê hunerî jî *Mihemed Zade* bi rê ve biriye. Ev kovar her çiqas li ser navê otonomiya Kurdistanê jî çap bûbe, naveroka wê bi pesn û medhên *Sadam Huseyn* tije ye û ji bo

zarokan tişta ku berçav kiriye propagandaya hikûmeta Baas a Iraqê û şirînkirina *Sadam Huseyn* e.

**25. Awat û Hêvî گۆڤاری ئاوات و هیڤی (1996):** Kovareke demsalî ya zarokan e ku ji aliyê rêkxirawî MAG ve hatiye weşandin. Di hin hejmaran de nivîsiye ku hikûmeta Swêdê û Hollandayê piştgirî dane vê kovarê û li Hewlêrê di çapxaneya *Wezareta Rewşenbîrî* de çap bûye. Ev kovar nehatiye firotin û wek diyarî hatiye belavkirin. Berpirs û amadekarên vê kovarê *Şêrzad Hesen* û *Omer Ebdulla* ne.

**26. Perîstan پەریستان (31.1.1992-17.4.1992):** Ji aliyê *Yektîtiya Niştimanî Kurdistan*(YNK) ve wek rûpeleke rojnameya *Kurdistanî Nû* hatiye weşandin. Di hejmara şeşem a rojnameyê de dest pê kiriye û heya hejmara dozdehan dewam kiriye. Sernûserê vê rûpelê *Arslan Bayz* bû.

**27. Hêvî هیڤی (1995):** Wek paşkoya rojnameya *Kurdistanî Nû* bi taybet ji bo zarokan weşiyaye.

**28. Pelgezêrîne گۆڤاری پەلکەزێرینە (2001-2003):** Ev kovar ji aliyê *Rêkxirawî Belawkirdinewey Rewşenbîrî Yasayî* ve bi taybet ji bo zarokan mehane li Hewlêrê hatiye weşandin. Rûpelên vê kovarê li gorî hejmarên xwe di navbera 8 ta 20 rûpelî de cuda bûye. Tîraja wê di navbera 1000 û 2000an de bûye. Gelek kesan di amadekariya vê kovarê de peywir girtine û hin ji wan ev kes in: *Alan Yusif*, *Awaz Kerîm*, *Dilêr Îbrahîm*, *Xedîce Akreyî*, *Reşîd Huseyn Xoşnaw*, *Qehar Qadir*, *Hanî Teha*, *Rizgar Ebdulqadir*, *Mewa Zade*, *Ezîz muhemed*, *Dilşad Elî*, *Sara Dilîr*, *Sara Elî*, *Hejîn Hewlêr*, *Huner Sebah*, *Arezû Muhemed* û gelek kesên din.

**29. Xende گۆڤاری خەندە (2002-…):** Kovareke mehane ye ji bo rewşenbîrî û perwerdeya zarokan ji aliyê *Komelî Îslamî* ve hatiye weşandin. Xwediyê îmtîyazê *Tewfîq Kerîm* û sernûserê kovarê jî *Serdar Reza* ye. Karê hunerî yê kovarê jî li ser milê *Rêbaz Muhemmed* e. Lêbelê gelek kesên din ked dane kovarê û carinan sernûserên cuda kovarê amade kirine. Li Silêmanî hatiye çapkirin.

**30. Kolare گۆڤاری کۆلارە (15.1.2002-25.1.2003):** Wek heftanemeyeke zarokan li gorî hejmarên xwe di navbera 20 ta 24 rûpelan de li Silêmanî di çapxaneyên *Bedirxan* û *Şivan* de çap bûye. Xwediyê îmtîyazê û birêvebirê giştî *Helgurd Ebdulwehab* e. Sernûserê vê kovarê jî *Îdrîs Lawe* ye.

**31. Şilk û Şa شلک و شا (?):** Wek paşkoyeke rojnameya Hewal li Kerkûkê weşiyaye.

**32. Gedîle (?):** Heftenameyeke zarokan e ku bi 4 rûpelî li Hewlêrê ji aliyê *Wezareta Rewşenbîrî* ya Hukûmeta Herêma Kurdistanê ve wek paşkoya *Rojnameya Herêma Kurdistanê* hatiye çapkirin. Xwediyê îmtîyazê wezareta rewşenbîrî ye. Karê sernûseriya vê heftanemeyê li ser milên *Seyran Selah* e û wek cîgirê sernûser jî *Dara Muhemed Elî* ye.

**33. Lane (1993):** Wek paşkoya kovara *Raber* ji aliyê *Yekîtiya Rewşenbîrên Muslaman ên Kurd* ve hatiye amadekirin. Ji ber ku kovara *Raber* kovareke mehane ya îslamî ye, naveroka Laneyê jî der barê rewşenbîriya îslamî de ye. Di kanûna duyem de hejmara yekem weşiyaye û hejmarên çarem û pêncem bi hev re di tîrmeh û tebaxa sala 2003yan de weşiyane. Ev belavok ji 12 rûpelan pêk hatiye.

**34. Gulzar (1994):** Paşkoya heftenameya bi navê *Gulan* e. Bi tevahî hejmarek bi qasî heşt rûpelan li Hewlêrê çap bûye.

**35. Sîndabadî Bexda (2000-…):** Kovareke demsalî ya zarokan e û ji aliyê *Wezareta Rewşenbîrî* ya Iraqê ve li Bexdayê tê weşandin. Hejmara wê ya dehemîn di sala 2002yan de weşiyaye û wek 32 rûpel çap bûye. Kesên ku di amadekirina kovarê de cih digirin ev in: *Dr. Elî Îlyasrî*, *Rîyaz El- Salim*, *Felah Huseyn*, *Ehmed Zerdeşt*, *Elî Mecîd* in.

**36. Mameyare (?):** Kovareke rewşenbîrî û perwerdeyî ye ku ji aliyê *Dibistana Mameyare* li Silêmanî salê carekê hatiye weşandin. Serperiştê kovarê *Sedîq Ebdulkerîm* e ku ew birêvebirê dibistanê ye jî. Sernûserê kovarê *Hesen Muhemed Heme Kerîm* e.

**37. Perîstan (1993):** Kovareke mehane ya zarokan e ku wek paşkoya rojnameya *Kurdistanî Nû* weşiyaye. Pêşî wek rûpel heya hejmara diwazdehemîn weşiya û piştre wek belavokeke çar rûpelî 33 hejmar jê derçûn û dawiyê jî wek kovar hat çapkirin. Bi tevahî çar hejmar jê çap bûne. Ji aliyê YNKê ve hatiye weşandin. Li Hewlêrê di du çapxaneyên cuda de hem di çapxaneya *Zankoya Selaheddîn* de hem jî di ya *Wezareta Rewşenbîrî* de çap bûye. Sernûserê kovarê *Arslan Bayz* e. Sekreterê nivîsê *Mewlûd Îbrahîm Hesen* û karê hunerî jî li ser milê *Helgurd Ebdulwehab* e. Bi tevahî nêzî 60 navên nivîskarên cuda di vê xebatê de cih girtine.

**38. Zeng û Beng (Îlon 2001- Sibat 2003):** Kovareke mehane ya zarokan e ku ji bo rewşenbîrî û perwerdeyê, li Duhokê di çapxaneya *Hawarê* de weşiyaye. Bi tevahî 17 hejmar jê derçûne. Xwediyê îmtiyazê *Beyan Ehmed Husên* e. Sernûseriya kovarê pêşî ji aliyê *Dêwal Hacî Casim* ve û piştre ji aliyê *Ecîb Ebdulla* ve hatiye kirin.

**39. Aga (2002):** Ji aliyê *Rêxistina Kurdistanê a Hişyarkariya Mayînan* ve 3 hejmar hatiye weşandin. Tiraja vê kovarê li gorî kovarên din ên zarokan bilindtir bû ku hejmara yekem û duyem 10000 jê çap bûn. Ji bo ku zarokan hişyar bikin û bi wan bidin zanîn ka xwe çawa ji mayînan û erdên mayînkirî biparêzin, ev kovar hat amadekirin. Xwediyê îmtîyazê *Sîrac Barzanî* ye û karê sernûserî li ser milê *Cîhad Erşed* û karê hunerî jî li ser milê *Dilşad Elî* bû.

**40. Edebî Mindallan (1985-1990):** Ev wek belavokek e ku ji komek berhemên edebî ji bo zarokan, bi tenê du hejmar derçûye ku hejmara yekem di Kanûna Paşî ya sala 1985an de reş û sipî hatiye weşandin. Ji aliyê hin helbestvan û çîroknûsên serbixwe ve bi tevahî 20 rûpel li Hewlêrê di çapxaneya *Hewlêrê* de hatiye çapkirin. Ev helbestvan û çîroknûs; *Rustem Bacelanî*, *Necat Refîq Hilmî*, *Pîrbal Mehmûd*, *Îsmaîl Tenya*, *Selah Selîm Seydok*, *Xalid Şeyda* û *Feysel Dêhatî* ne. Hejmara duyem a vê kovarê jî pênc sal şûnde di sala 1990an de ji aliyê folklornas *Sedûllah Şêxanî* ve hatiye weşandin.

**41. Kenarî (2002-…):** Kovareke mehane ya zarokan e ku ji aliyê *Saziya Kenarî* ve hatiye weşandin. Li Silêmanî di çapxaneya *Renc* de 5000 heb çap bûye. Aza Mehmûd xwediyê îmtîyazê ye. Sernûsera kovarê jî *Roza Heme Salih* e.

**42. Tan Tan (?):** Kovareke zarokan e ku bi taybetî ji bo zarokên 10 ta 18 salî weşiyaye. Ji aliyê *Binkey Çapemeniya Time* ve hatiye amadekirin. Li Silêmanîyê di çapxaneya *Dilêr* de çap bûye. *Bextiyar Muhemed Şerîf* xwediyê îmtîyazê ye û sernûserê kovarê jî *Muhemed Kemal Ebdulmecîd* e.

**43. Tirş û Şîrîn (25.10.2002):** Wek paşkoya kovara zarokan a bi navê *Kolare* weşiyaye. Bi taybetî di naveroka wê de metel û lîstik zêdetir cih girtine. Li Silêmanîyê di çapxaneya *Asa* de hatiye çapkirin. Birêvebirê giştî *Helgurd Ebdulwehab* e. Sernûser *Îdrîs Lawe* ye û serperiştê belavokê jî *Bêstûn Ferhad Şakir* e.

**44. Dinyayê Mindallan (Tebax 1999):** Belavokeke taybet ji bo zarokan e ku ji aliyê *Navenda Parastina Mafên Zarokan a Kurdistanê* ve hatiye weşandin. Xwedîyê îmtîyazê *Sergul Ehmed* e.

**45. Jînname (2001-…):** Kovareke mehane ya zarokan e ku di warê tendurustî û parastina mafên zarokan de ye. Li Hewlêrê çap dibe û ji aliyê *Wezareta Tenduristîyê ya Hukûmeta Herêma Kurdistanê* ve tê amadekirin. *Ebdullah Salih* xwediyê îmtîyazê yê kovarê ye û *Mutesem Ebdulrehman* jî sernûser e.

**46. Xatûzîn (2003-?):** Kovareke mehane ye ku bi taybetî der barê pirsgirekên jinan û zarokan de ye. Ji aliyê *Navenda Xatûzîn* ve li Hewlêrê hatiye amadekirin û çapkirin. Xwediya îmtîyazê *Naznaz Muhemed Ebdulqadir* e. *Çilore Herdî* jî sernûser e.

**47. Xalxalok (1992):** Kovareke zarokan e ku wek paşkoya rojnameya *Botan* ji aliyê *Partiya Gel a Demokrat a Kurdistanê* ve li Duhokê hatiye weşandin. Hejmara yekem di havîna sala 1992yan de derketiye ku bi tenê ev hejmar jê derçûye.

**48. Newroz (1980):** *Helgurd Ebdulwehab Cundiyanî* di şazdeh saliya xwe de li Hewlêrê bi destnivîsa xwe ev kovar bi awayekî veşartî yanî nefermî amade kiriye. Bi tevahî li ser hev 3 hejmar ji vê kovarê derçûne.

**49. Sirûşt (Kanûna Paşî 1983-Adar 1983):** Belavokeke zanistî ya zarokan bûye ku li ser hev 2 hejmar jê derçûne. Ev belavok ji aliyê Yekîtîya Niştimanî Kurdistan ve hatiye weşandin ku serperiştiya kovarê *Ebbas Îsmaîl Arî* kiriye. Hejmara duyem di meha Adara sala 1983yan de weşiyaye. Ev belavok wek yekem belavoka zanistî ya kurdî ya ji bo zarokan tê hesibandin.

Ji bilî van kovar û belavokan di xebateke *Raûf Hesen* de ji ber ku wî nexwestiye nivîsa xwe bi awayekî bîbliyografîk li ser rojnamegeriya zarokan binivîse bi tenê navên çend kovar û paşkoyên zarokan dane. (Hesen 2015) Em ê wan kovar û paşkoyên ku me li vir bi berfirehî nedane nasîn, li vir navên wan û salên derçûna wan rêz bikin: Gizing (1967), Tîşk (1969), Perwerde û Zanist (1971), Rehêlle (1971), Çiya (1971), Hêvî û Hîwa (1995), Roj (1999), Dîlanê (2000), Goş (2001), Ronahîy Mindallan (2002), Alekok (2004), Mêrgî Mindallan (2005), Asoy Mindallan (2006), Jînwar (2006), Gullegenim, Mêrgî Mindallan, Estêre (1996 Î. Elî Kemal bi van navan cuda derxistiye.), Şemame (2011). Ji ber ku der barê van navan de çavkaniyeke xwedî agahiyên berfirehtir di destê min de tunene, mirov nikare bibêje ka kîjan kovareke serbixwe û kîjan paşko an jî belavoke zarokan e. Lewra li vir me bi tenê navên wan jî dan ji ber ku di çavkaniyan de wek kovar, paşko an jî belavokên zarokan derbas dibin.

### 2.3.2.Weşanên Televîzyonan û Televîzyonên Taybet ên Ji Bo Zarokan

Li rojhilata navîn cara ewil di nav welatên ereb de îstasyona televîzyonê li Iraqê hatiye danîn û di sala 1956an de ji aliyê hukûmetê ve hatiye bikaranîn. (Boyd 1982: 111. Vgz. Hassanpour 1997: 433) Piştî Bexdayê di sala 1967an de li Kerkûkê îstasyonek hat

vekirin. Wê gavê bername hemû bi erebî bûn. Lê piştî sala 1969an hukûmeta Iraqê der barê mafên çandî yên kurdan de qerarnameyek derxist û tê de nîşan kir ku heya televîzyoneke taybet a kurdan ava bibe, dê di *Kerkûk Tv* de bernameyên kurdî bên zêdekirin. Her çiqas gilî û gazincên kurdan ji aliyê maweya weşana kurdî ya *Kerkûk Tv* de hebin jî tê gotin ku wê demê rojê şeş saetan di vê televîzyonê de weşana kurdî hebû. (Hassanpour 1997: 433-434) Piştî ku li Iraqê kurdan birêvebiriya xwe ya federal ava kir, Partiya Demokrat a Kurdistanê bi navê *"Kurdistan"* televîzyoneke serbixwe ya kurdî ava kir. Piştî ku rejîma Baas rûxiya û ji holê rabû, ji vê aliyê ve kurd zêdetir pêş ketin û îroroj êdî ji bilî bi dehan televîzyonên kurdî yên serbixwe, sê televîzyonên bi taybet ji bo zarokan jî hatin vekirin.

1. **Kerkûk TV (18.11.1967-…):** Li gorî ku *Reza Shiwan* dibêje, heya sala 2003yan berî ku rejîma *Baas* hilweşe, ev televîzyon bi navê "ئیستگەی تەلەفزیۆنی ئەمنی" (Îstgey Televîzyonî Emnî) weşana xwe dikir û piştî sala 2003yan navê wê wek "*Kerkûk Tv*" hatiye guhertin. Di dema rejîma *Baas*ê de her çiqas televîzyon bi kurdî weşanê kiribe jî kar û barên birêvebiriyê di destê rejîmê de bûye. Lewra gelek caran weşan bi dawî bûne, kêm bûne an jî naveroka wan bûye propagandaya rejîma *Baas*ê ku ji vê yekê jî kurd wê çaxê her gilîdar bûne. Di vê televîzyonê de hin bernameyên kurdî yên ji bo zarokan hatine amadekirin ku me li jêr hin ji van dan nasîn ev in:[5]

- **Govarî Mindallan گۆڤاری منداڵان:** Xanimeke bi navê *Pexşan Koyî* ev bername amade û pêşkeş dikir.
- **Kolke Zêrîne کۆلکە زێرینە :** *Necat Karesûl* ev bername amade û pêşkeş dikir. Gelek beşên vê bernameyê li Hewlêrê di dibistaneke seretayî de dihat qeydkirin. Weşana vê bernameyê, demeke dirêj dewam kir.
- **Cîhanî Mindallan (1984-1994):** Di hefteyekê de carekê dihat weşandin û maweya weşana vê bernameyê nîv saet bû. *Reza Shiwan* bername amade dikir. *Nazenîn Hemelaw* pêşkeşvana yekem a vê bernameyê bû. *Semîre Hemelaw* ji bo du mehan karê pêşkeşiyê girtiye ser milên xwe. Ji bo çar salan jî *Zozan Reza* ku keça *Reza Shiwan* e, pêşkeşiya vê bernameyê kir. Di hejmareke rojnameya *Hawkarî* de hatiye dazanîn ku *Zozan Reza* pêşkeşvana herî biçûk e ku bernameyeke televîzyonê pêşkeş dike.
- **Çîrokan:** Ev bername di hefteyekê de carekê, ji bo nîv saetê dihat weşandin. Kesê ku ev bername amade kiriye jî *Reza Shiwan* e.
- **Cigergoşekan (1985):** Di hefteyekê de carekê nêzî saetekê ev bername diweşiya û ji salekê zêdetir dewam kir. Karê amadekarî û pêşkeşvaniya bernameyê *Mihemed Rehîm Remezan* dikir.
- **Çîrokî Hefte:** Ev bername jî di hefteyekê de carekê dihat weşandin û ji aliyê *Hello Haşim Cebar* ve dihat amadekirin û pêşkeşkirin. Di vê bernameyê de her hefte çîrokek dihat vegotin û piştre ev bername bi bernameya *Cîhanî Mindalan* re hat yekkirin ku di nav vê bernameyê de ji bo 5 kêlîkan çîrokek dihat vegotin.

2. **Kurdmax Pepûle TV (2014):** Ev televîzyoneke taybet ji bo zarokan e ku bi du zaravayên kurdî (Kurmancî û Soranî) weşana xwe dike. Fîlmên zarokan, rêzefîlmên

[5] Der barê vê televîzyonê û weşanên wê yên ji bo zarokan de ji bo agahiyên berfirehtir binêrin: Shiwan, Reza. (2015) "Rageyandinî Mindalan (Beşî Sêyem); Radyo, Televîzyon, Înternet" http://www.hawpshti.com/ku/?p=4783 (Dema jêgirtinê: 19.01.2017)

wan û herwiha bernameyên ji bo perwerdekirina zarokan di weşana vê televîzyonê de cih digirin. Manon, Pişîleyê Sor, Rawçî Ejdîhekan, Estêreyê Laura, Oscar, Pokoyo, Minscool, Rory, Zazy Soo, Ozie Boo, Dragon, Cîhanî Ajelan, Balîfî Pînekraw û Rajoo navên hin ji van bernameyan in. Navenda vê televîzyonê li Hewlêrê ye. Li ser frekansên Nilesat û Turksatê weşana xwe didomîne.

3. **Pêlîstank TV (1.5.2012):** Ev televîzyon di kurdî de wek yekem televîzyona taybet a zarokan tê qebûlkirin û navenda wê li Duhokê ye. Pêşî çend kesên ji Herêma Kurdistanê ev televîzyon damezirandin û piştre dewrê kesekî bi navê *Hacî Tel* kirin ku ew ji bajarê Çewligê (Bîngol) ye û li Herêma Kurdistanê karê televîzyongeriyê dike. Di vê televîzyonê de giraniya weşanê li ser mûzîk, stran û kilaman e ku ji aliyê zarokên kurd ên wê herêmê ve tê kirin. Bi vê rêyê hin karakterên vê televîzyonê navdar bûne ku *Rindê* yek ji wan karakteran e. Li gor ku di hevpeyvînekê de xwediyê televîzyonê *Hacî Tel* gotiye, hin plan û projeyên wan hene ku bernameyên din jî wek fîlm û rêzefîlmên zarokan û karakterên kurd ên ferazî çêkin û di nav weşana xwe de zêde bikin. (Tel 2013)

4. **Zaro TV (2013):** Ev televîzyoneke taybet ji bo zarokan e ku ji aliyê *Hukûmeta Herêma Kurdistanê* ve li Hewlêrê hatiye avakirin. Ofîsên wê li bajarên wek Silêmanî û Duhokê jî hene. Televîzyon bi zaravayên kurmancî û soranî weşana xwe di navbera saet sisê pîştî nîvro heta nehê şevê didomîne. Birêvebirê giştî yê televîzyonê *Halgurd Abdulwahab Cundiyanî* ye. Herwiha hin hewl tên dayîn ku ji saziyên navnetewî yên wek UNESCO û UNICEFê piştgirî bigirin ji bo Zaro Tv. Turtle Hero, Li Gel Giyaneweran, Golzar hin ji bernameyên vê televîzyonê ne.

5. **Kurdistan TV (1998):** Ev televîzyoneke giştî ye ku wek televîzyona yekem a Herêma Kurdistanê jî tê qebûlkirin. Televîzyoneke ne bi taybetî ji bo zarokan e. Lê hin bernameyan ji bo zarokan jî weşandine wek bernameya bi navê *Stranên Zarokan*.

6. **Badinan SAT (15.7.2012):** Ev televîzyoneke giştî ye ku carinan ji bo zarokan jî hin bernameyan diweşîne û bi zaravayê kurmancî û zêdetir bi devoka behdînî weşana xwe dike. Bernameyeke bi navê *Cîhana Zarokan* di vê televîzyonê de ji bo zarokan hatiye weşandin.

7. **Waar TV (2013):** Navenda vê televîzyonê li Duhokê ye û bi taybetî ne ji bo zarokan e. Lê hin bername û anîmasyonên ji bo zarokan di vê televîzyonê de weşiyane ku yek ji van bernameyan bi navê *Demê Zarokan* e.

Ji bilî van televîzyonan hin televîzyonên din hene ku cih nadine bernameyên zarokan û di qadên cuda de mînak wek di nûçegihaniyê de weşana xwe dikin ku mirov *Rûdaw Tv* û *K24 Tv* dikare wek mînak nîşan bide. Ji bilî van hin televîzyon jî hene ku televîzyonên partiyên sîyasî ne û li gorî rêzikên xwe weşanê dikin.

### 2.4.Xebatên ku li Îranê Hatine Kirin

Rewşa çapemenî û medyaya giştî ya kurdî li Îranê jî ji welatên din ên ku kurd lê dijîn, cuda nebû. Gelek caran zext û zordarî, talan û qedexe li Îranê jî her hebûye û berdewam e. Li Îranê rewşa medya û çapemeniya kurdî li gorî serdeman guheriye. Berî sala 1946an çend rojname û kovarên ku dihatin weşandin, bi dizî dihatin belavkirin. Bi taybetî di serdema monarşiyê de ji aliyê îstîxbarata veşartî ve çapemeniya kurdî her gav di

e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi
*Journal of Oriental Scıentific Research (JOSR)* www.esarkiyat.com ISSN: 1308-9633

*JOSR* Nisan-2017 Cilt:9 Sayı:1 (17) (s. 107-132) *JOSR* April-2017 Volume:9 Issue:1 (17)

bin çavan de bû û dihate şopandin. Lewra bi rehetî ev kar nedimeşiya. (Hassanpour 1997: 330-333/393-401) Berî damezirandina *Komara Kurdistanê* di 16ê Tebaxa sala 1942yan de bi avabûna *Komaley Jiyanewey Kurdistan* (Komaley JK) li Îranê dest bi xebatên rewşenbîrî û polîtîk hatin kirin. Komaley JK ji nav (*Komeley Azadîxwazî Kurdistan*) afirî û derket ku ev komele li rojhilatê Kurdistanê, zêdetir li devera Mukriyan xwe bi cih kiribû û Komaley JK jî nîvfermî li Mehabadê hatibû damezirandin. Bi avabûn û geşedana vê komeleyê re karên rewşenbîrî yên li nav kurdan, geş bûn û cara yekem bi xwedîtiya vê komelê, di tîrmeha sala 1943yan de bi navê *Niştiman* kovarek çap bû û heya Gulana 1944an li ser hev 9 hejmar jê çap bûn. (Vali 2010: 42-43) Komaley JK bi hin sedemên îdeolojîk û zêdetir jî polîtîk, xwe fesih kir û di 15ê Tebaxa 1945an de veguherî û bû *Partiya Demokrat a Kurdistanê ya Îranê*. Pir zêde nekişand, nêzîkî 6 mehan şûnde vê partiyê li Mehabadê, di 22 Kanûna Paşîn a 1946an de *Komara Kurdistanê* damezirand û îlan kir. (Vali 2010: 74-81) Di kurtejiyana vê komarê de ku nêzîkî salekî bû, nêzî pênc şeş kovar û rojnameyên mayînde û biqîmet ji bo dîroka kurdan, li ber dest man ku yek ji van; bêguman yekemîn kovara zarokan a kurdî *Girr û Gallî Mindallanî Kurd* bû. Piştî hilweşîna vê komarê careke din çapemenî û medyaya kurdî rawesta an jî bi awayekî veşartî hat kirin heya ku di sala 1979an de pergala monarşiyê hilweşiya û îqtîdara îstîxbarata *Savak*ê lawaz ket. Piştî vê di çapemenî û medyaya kurdî de hin livîn û tevger çêbûn û heta hukûmetê bixwe jî bi rêya hin saziyên xwe yên çap û weşanê, bi zimanê kurdî hin berhem dan weşandin. Her çiqas naveroka van berheman piranî dînî bin jî wê demê ji aliyê *Enstîtuya Geşedana Rewşenbîrî ya Ciwan û Zarokan* ve çar berhemên çîrokên zarokan hatin weşandin. Dîsa di sala 1984an de ji aliyê hukûmetê ve navendeke edebî û çandî ya bi navê *Selahaddînê Eyyûbî* hat avakirin. (Hassanpour 1997: 330-333) Bi rêya vê navendê hin berhemên kurdî weşandin û her wiha bi navê *Sirwe* kovareke giştî rewşenbîrî û edebî derxistin ku wek beşeke vê kovarê ji bo zarokan jî veqetandibûn. Du sê sal piştî vê dîsa ji aliyê hukûmetê ve di televîzyona fermî ya hikûmetê ya bi navê Sahar Tv de bi qasî saetek û nîvê weşana kurdî dest pê kir û heya ku di sala 2014an de bû televîzyoneke serbixwe ya kurdî ya hikûmetê. Li gorî rewşa berê di çapemenî û medyaya kurdî de Îran ne wek berê be jî careke din gelek zext û qedexe di vî warî de ji bo kurdî hene. Ji destpêkê heya niha li Îranê di warê çapemî û medyayê de ji bo zarokan çi hatibe weşandin û amadekirin bi kurtî li jêr hatiye nasandin.

### 2.4.1. Kovarên Zarokan

**1. Gir û Gallî Mindallanî Kurd گۆڤاری گڕوگاڵی منداڵانی کورد (1946):** Serperişt û mudîrê îdareyê yê kovarê *Qadirî Muderrîsî* ye ku ev kovar xwerû bi zaravayê soranî, bi temamî li ser hev 3 hejmar derketine û mêjûya çapbûna hejmarên wê bi vî şiklî ye: hejmara yekem di (1325 بانەمەڕ 1/ 21 Nîsan 1946)an de, hejmara duyem di (1325 جۆزەردان 1/21 Gulan 1946)an de û hejmara sêyem jî di (1325 پووشپەڕ 1/21 Pûşper 1946)an de derçûye.

Her du hejmarên ewil, ji bilî bergan, ji 12 rûpelan pêk tên û hejmara sêyem jî ji 13 rûpelan pêk hatiye. Kovar ji aliyê *Komara Kurdistanê* û li paytext Mehabadê di *Çapxaneya Kurdistanê* de çap bûye. Li ser bergên hejmara yekem, wêne tunene. Li ser berga dawî ya hejmara duyem wêneyek heye. Li ser berga pêşî ya hejmara sêyem jî wêneyeke

*Selahaddînê Eyyûbî* heye ku li her du teniştên wêneyê du dirûşm hene û li tenişta rastê: “Her bijî fexrê qewmê Kurd û sultanê Ereb” û li tenişta çepê jî wiha hatiye nivîsîn: “Tu nemirî Selaheddînê Eyyûbî neseb”.

2. **Girr û Gall گۆڤاری گڕوگاڵ (1979):** Ev kovar li Kirmanşahê ji aliyê *Muhsîn Şahsiwar* ve bi tevahî du hejmar hatiye weşandin. Hejmara yekem a vê kovarê bi kurdî û hejmara duyem jî bi kurdî û farisî hevpar weşiyaye.

3. **Estêre گۆڤاری ئەستێرە (?- 1979):** Li Senendecê bi tevahî 6 hejmar jê derçûne. Tê diyarkirin ku hejmara şeşem a vê kovarê di 22yê Gulana 1979an de hatiye weşandin.

4. **Dinyayê Mindallan گۆڤاری دنیای منداڵان (2002-…):** Ev kovar ji aliyê *Partiya Demokrat a Kurdistanê ya Îranê* ve li ser navê *Weqfa Parastina Zarokên Rojhilatê Kurdistanê* wek paşkoyeke *Kovara Kurdistanê* li Hêrêma Kurdistana Federal tê çapkirin û ji bo zarokên Rojhelatê Kurdistanê tê şandin û belavkirin. Heya niha 174 hejmar jê derçûne. Sernûsera kovarê *Şîlan Qurbanîfer* e. Di lijneya nivîskaran de kesên wek *Kawe Ahengerî*, *Hana Wirya*, *Nîmet Mela*, *Mîna Sultanzade* cih digirin.

5. **Nêrgiz گۆڤاری نێرگز (2009-…):** Kovareke mehane ya zarokan e ku heya niha 60 hejmar jê derçûne. Bi armanca perwerdekirina zarokên kurd ên li Îranê hatiye weşandin.

6. **Sirwe گۆڤاری سروە (1984-?):** Ev kovareke giştî rewşenbîrî û edebî ye ku ji aliyê weşanxaneya bi navê *Selahaddîn Eyyûbî* li Îranê û bajarê Ûrmiyê hatiye weşandin. Vê weşanxaneyê xebatên xwe bi piştgiriya hikûmetê amade kirine. Di vê kovarê de wek beşeke taybet ji bo zarokan hatiye veqetandin ku ji 200 hejmarî zêdetir belav bûye. Sernûserê kovarê *Hêmin Mukriyanî* bû. *Perwîz Cîhanî* jî di serî de yek ji xebatkar û nivîskarê kovarê bû.

7. **Amanc Bo Zarokan (Kanûna Pêşî 1985- Gulan 1989):** Belavokeke rangorengo ya taybet bo zarokan bû ku li Tehranê wek paşkoya kovara Amanc derçûye. Hejmara 21an di Gulana sala 1989an de weşiyaye. (Tenya 2016)

#### 2.4.2. Televîzyon

1. **Sahar Tv Kurdî (01.11.2014):** Televîzyona fermî ya hikûmetê bi navê *Sahar*ê xebata xwe di 25ê tîrmeha sala 1988an de bi saetek û nîvê bernameya şevê dest pê kir. Dema weşanên kurdî yê bernameyên televîzyona *Sahar*ê di sala 2000an de gihîşt 2 saetan û di sala 2002an de saeteke din jî lê zêde bû. Herwiha di sala 2004an de dema weşanê ya bernameyên vê kanalê nîv saetên din lê zêde bû. Ji dawiya tîrmeha sala 2005an heya damezirandina kanala *Sahar* 2yê, derdora 240 deqîqeyan di du beşan de û her yek bi qasî du saetan bername belav dikir. Lê piştî damezirandina kanala *Sahar* 2yê di sala 2009an de bername di şevanerojê de di du beşên sibê (4 saet) û şevê (5 saet) de ji kanala *Sahar* 2yê weşan dikir. Herî dawî ji 1ê meha Çiriya Paşî ya sala 2014an û pê ve kanala cîhanî ya *Sahar Kurdî*yê bi awayekî serbixwe û 24 saetan li ser setilaytên (peykên) Nilesat, Hotbird û Arabsatê bi belavkirina bernameyên cûrbicûr bi kurmancî û soranî xebata xwe didomîne. Di van demên dawî de bernameyeke zarokan jî bi soranî di vê kanalê de hatiye amadekirin.

- **Hetell Metell Hellame هەتەڵ مەتەڵ هەڵامە (13.12.2016):** Ev bername heya 18ê Kanûna Duyem a sala 2017an bi tevahî 33 hejmar weşiyaye. Ev bernameyeke nîvsaetî

*JOSR* Nisan-2017 Cilt:9 Sayı:1 (17) (s. 107-132) *JOSR* April-2017 Volume:9 Issue:1 (17)

ye ku ji aliyê xanimeke bi navê *Faîze Mehmûdî* ve tê pêşkeşkirin. Ev bernameyeke pakêt e ku tê de mûzîk, perwerde, fîlmên zarokan cih digirin. Du karakterên zarok bi navê *Nasko*l û *Xirtol* hene ku wek zarokên malekê û malbatekê ne. Bername pêşî bi mûzîkekê dest pê dike, paşî beşeke bi navê *Çîrokî Mam Bapîr* heye û careke din mûzîkek bi klîba xwe tê li ser ekranê û piştre rêzefîlmeke zarokan a bi navê *Axayê Xoşhal* tê nîşandan û piştî mûzîkeke din xatir tê xwestin û dawî li bernameyê tê. Di nav nîv saetî de sêwirandin û pêşkeşkirina bernameyê ji aliyê *Faîze Mehmûdî* û du karakterên zarok ên bi navê *Naskol* û *Xirtol* ve tê kirin. Derhêner û amadekarê vê bernameyê *Mistefa Mehmûdî* ye. Nûsera bernameyê jî xanimeke bi navê *Perwîn Melîkzade* ye.

**2.5. Xebatên ku li Sûrîyê Hatine Kirin**

Piştî şerê cîhanê ji ber têkçûna dewleta Osmanî axa binxetê ku qismê Sûriyê bû, ji aliyê Fransiz û Îngilizan ve ji destê Osmaniyan hat standin û kurdên li devera Cizîrê, Hesekê, Kobanê, Çiyayê Kurmanc, Efrîn û gelek deverên din ên wî milî ji kurdên Tirkiyê hatin veqetandin. Bi rastî di serdema Fransizan de ku ev beramberî salên navbera 1920 heya 1946an dike, weşan û çapemeniya kurdî li Sûriyê serbest bû û wê demê ji aliyê birayên Bedirxanî, *Celadet Elî* û *Kamiran Elî Bedirxan* ve çend kovarên bi zaravayê kurmancî hatin weşandin. (Reş 2013: 27-38) Lê berî wan kurdekî Îranê bi navê *Huseyn Huznî Mukriyanî* li Sûriyê xwediyê çapxaneyekê bû û herwiha cara ewil ê ku pirtûkeke kurdî jî çapkiribû ev şexs bixwe bû. Di sala 1932yan de *Celadet Elî Bedirxan* bi navê *Hawar*ê kovarek da weşandin ku ev kovareke edebî, hunerî û çandî bû û bi tevahî li ser hev 57 hejmar jê derçûn ku di 5 hejmarên pêşî de beşeke bi navê *"Stûna Zarowan"* bi taybetî ji bo zarokan hatibû terxankirin. (Ceweri 1998) Piştî desthilata Fransizan hukûmeteke navendî li Sûriyê ava bû ku derfeta heyî ya çapemeniya kurdî jî ji destên kurdan stand heta gihişte wê astê ku kurd ji hemwalîtûbûnê hatin derxistin û navên "Ecanîb" û "Mektûmîn" li van kesan kirin ku ew xwedî tu maf û heqî nebûn. (Malmîsanij 2006: 107) Lewra jî di rewşeke wiha de çi xebatên rewşenbîrî hatibin kirin jî hemû bi dizî û veşartî an jî nefermî hatin kirin. Di vê qonaxê de avabûna *Partiya Demokrat a Kurdistanê ya Sûriyê*, her çiqas qedexe be jî bi awayekî nefermî pêleke din li pêşiya çapemeniya kurdî vekiriye û heya roja îro gelek kovar û rojname hatine weşandin. (Reş 2013: 46)

**2.5.1. Kovarên Zarokan**

1. **Hawar (1932-1943):** Xwediyê kovarê *Celadet Elî Bedirxan* e û vê kovarê li Şamê bi tevahî li ser hev 57 hejmar weşandine. Di pênc hejmarên pêşî de bi navê *Stûna Zarowan* û *Stûna Feqehan* beşeke taybet ji bo zarokan û xwendekaran hatiye veqetandin.
2. **Gulîzar (2000-2002):** Kovara zarokan a kurdî ye ku xwedî û berpirsiyarê wê *Lawikê Hacî* ye. Xwerû bi zimanê kurdî bû. Bi tevahî 9 hejmar jê derçûne û hejmara dawî di sala 2002yan de weşiyaye. Ev kovar li ser pelên A4 wek fotokopî hatiye zêdekirin û belavkirin. (Reş 2013: 92)

**2.5.2. Televîzyon**

1. **Ronahî Tv (2011-…):** Ev televîzyoneke giştî ye ku zêdetir weşanên polîtîk û siyasî dike. Navenda vê televîzyonê li Ewropayê ye û naveroka weşana wê bi temamî li

ser rojeva kurdên Sûriyê ye. Di nav bernameyên vê televîzyonê de bi taybet bernameyeke ku ji bo zarokan hatibe amadekirin, tunene.

**Encam**

Axirî dema ku mirov bi giştî lê dinêre, bi qasî ku em gihiştinê û me ev xebat peyda kirin, li Tirkiyê heya niha di warê kovargeriyê de 11 kovarên serbixwe ên zarokan û paşkoyeke kovareka giştî derçûne. Di warê televîzyonê de jî televîzyoneke serbixwe ya zarokan û du televîzyonên giştî ku di xwe de bernameyên ji bo zarokan dihundurînin, ava bûne. Li Ewropayê heya niha 7 kovarên zarokan ên serbixwe derçûne û du televîzyonên giştî ava bûne ku tê de ji bo zarokan gelek bername hatine amadekirin. Li Iraqê û Herêma Kurdistanê heya niha nêzî 49 kovarên serbixwe ji bo zarokan û herwiha du sê belavok û rûpelên taybet ji bo zarokan di paşkoyên rojname û kovarên giştî de hatine weşandin. Li vê parçeyê di warê televîzyongeriyê de heya niha 3 televîzyonên taybet ji bo zarokan ava bûne û nêzî 10 televîzyonên giştî yên ku ji bo zarokan jî bernameyan amade kirine, ava bûne. Li Îranê heya niha 6 kovarên serbixwe yên ji bo zarokan û paşkoyeke kovareke giştî derçûne û televîzyoneke giştî ya hikûmetê ava bûye ku tê de heya niha tenê bernameyek ji bo zarokan çê bûye. Li Sûriyê rewş xerabtir dixuye û heya niha li gorî çavkaniyên ber destên me kovareke serbixwe ji bo zarokan û rûpeleke taybet ji bo zarokan di kovareke giştî de derçûne û ji aliyê televîzyonê ve her çiqas kanaleke vê parçeyê hebe ku weşana xwe ji Ewropayê dike. Lê heya niha ev şeş sal in ku tu bernameyeke taybet ji bo zarokan neweşandiye.

Li gorî xebata ku derkete holê, bi awayekî pratîk hat dîtin ku têkiliyeke medya û zarokê hebûye û di kurdî de jî ev tişt xuyaye. Piştî ku zarok di navenda jiyanê de cihê xwe girt, di gelek plan û bernameyên sazkirina jiyanê de ji bo wan jî plan û bername hatin danîn. Kovar û tv’yên ku di vê xebatê de hatine berçavkirin, nîşanî me didin ku kurd jî mîna netewên din ên cîhanê xwestine plan û bernameyan ji bo zarokan deynin û wan perwerde bikin. Xuya ye ku di warê medya û çapemeniyê de bi kurdî her cûre berhem hene. Lêbelê ev cure an lawaz in an berdewam nebûne an jî pir kêm in û têrî potansiyela zarokên kurdan nakin. Ev xebat ji ber ku zêdetir nêrîneke ji aliyê çendaniya vî warî bû, di encamê de hat dîtin ku hema hema li her parçeyên ku kurd lê dijîn, hewl û xebatên wan çêbûne.

Di nav hemû kurdan de mînaka yekem a kovarê ji bo zarokan li Îranê derketiye. Ev yek pir muhîm e, lê bi qasî vê yekê muhîmtir ku piştî wê berhema yekem, ev war li wir pir lawaz maye ku ev jî li gor hin lêkolîneran bi rewşa siyasî ya wî welatî û pozîsyona kurdan a bi wir ve girêdayîye.

Mînakên Tirkiyê û Sûriyê her weku Îranê ne û xebatên ku li Ewropayê pêk hatine, nîşan didin ku kurdên nikaribûne li her çar parçeyên din van karan bikin, xwestine li Ewropayê pêk bînin û heya radeyekê pêk anîne jî.

Herî dawî rewşa Iraqê û Herêma Kurdistanê ye ku ji parçeyên din cudatiyeke wê heye ku ev jî eşkere bi berhemên çêbûyî û rewşa pêşketin û geşedana vî warî ya li wir dixuye. Belê cara yekem li Îranê mînaka yekem derçûye. Lê ev war ji aliyê geşedan,

pêşketin, dewlemendî, pircûreyî, têratî û astderbaskirinê de li Iraqê û dawiya dawî li Herêma Kurdistanê ruh peyda kiriye.

**Çavkanî**

AVŞAR Zakir, (Ocak-Haziran 2014) "Medya Okuryazarlığı", *İletişim & Diplomasi Akademik Hakemli Dergi,* Başbakanlık Basın ve Enformasyon Genel Müdürlüğü (BYEGM), sayı: 2. sayfa: 5-17.

BERZINCÎ, Ehmed Seyîd Elî. (2010), *Edebî Mindallan Le Govarî Gelawêj Da,* Sardam, Silêmanî.

CEWERÎ Firat, (1998), *Hawar Cild 1:1-23***,** Nûdem, Stockholm.

ÇOKAN Seçil. (Ağustos-Eylül 2005) "Çizgi Filmler ve Kuyrukları", *Hece Dergisi Çocuk Edebiyatı Özel Sayısı,* Hece, Ankara, sayı: 104-105, sayfa: 298-303.

EMÎN, Hisênê. (Gulan 1944) "Marşa Tîpan" *Kovara Ronahî,* Hejmar: 25, Çapxana Tereqiyê, Şam.

HASSANPOUR, Amir. (1997), *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil 1918-1985,* (Wer.) İbrahim Bingöl, Cemil Gündoğan, Avesta, İstanbul.

HAWAR, Muhemed Resûl. (2007), *Dîwanî Pîremêrdî Nemir,* Çapxaney Shvan, Hewlêr.

İŞLER, Esra İlkay Keloğlu. (Ocak-Haziran 2014) "Kültürel Ekme Kuramı Bağlamında Türkiye Üretimi Çizgi Filmler ve Çocuk Bilincinin İnşası", *İletişim & Diplomasi Akademik Hakemli Dergi,* Başbakanlık Basın ve Enformasyon Genel Müdürlüğü (BYEGM), sayı: 2. sayfa: 65-80.

KARDAŞ Canser, Diyaddin ALP, (2013), *Çocuk Edebiyatı ve Medya*, Eğiten Kitap, Ankara.

KOMA XEBATÊN KURDOLOJIYÊ. (2013), *Di Sedsaliya Wê De Rojî Kurd [1913],* Weşanên Entîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul.

MALMÎSANIJ, M. (2006), *Türkiye ve Suriye'de Kürtçe Kitap Yayımcılığının Dünü ve Bugünü*, Vate, İstanbul.

MARSİL, Medeni. (1998), *Cûreyên Nûçeyên Rojnamegeriyê,* Apec, Stockholm.

MISTEFA, Îdrîs Ebdulla. (2004), *Rojnamegerî Mindallan Be Zimanî Kurdî,* Wezaretî Rewşenbîrî, Hewlêr.

POLAT, Lokman. (1999), *Danasîn û Analîza Kovarên Kurdî,* Weşanên Jîna Nû, Bromma/Swêd.

REŞ, Konê. (2013), *Dîroka Rojnamegeriya Kurdî Li Sûrîyê û Libnanê 1932-2012,* Wezaretî Rewşenbîrî û Lawan, Duhok.

SAYILAN Gülden - ÇEVİRGEN Nihan, (Ocak-Haziran 2014) "Yazılı Basında Çocuk Temsilleri: Bir Bekleme Salonu Olarak Çocukluk", *İletişim & Diplomasi Akademik*

*JOSR* Nisan-2017 Cilt:9 Sayı:1 (17) (s. 107-132) *JOSR* April-2017 Volume:9 Issue:1 (17)

*Hakemli Dergi,* Başbakanlık Basın ve Enformasyon Genel Müdürlüğü (BYEGM), sayı: 2. sayfa: 97-115.

ŞİRİN Mustafa Ruhi, (Ocak-Haziran 2014) "Çocuk ve Medya: Eşitsizlikler Dünyası", *İletişim & Diplomasi Akademik Hakemli Dergi,* Başbakanlık Basın ve Enformasyon Genel Müdürlüğü (BYEGM), sayı:2. sayfa: 181-187.

VALİ, Abbas (2010), *Kürdistan Cumhuriyeti; İran'da Kürt Kimliğinin Oluşumu,* İngilizceden Çeviren: Zeri İnanç, Avesta, İstanbul.

**Çavkaniyên Online**

BALUKEN İdris, Pervin BULDAN. (2013) "Kamu Hizmetlerinin Anadillerde Yerine Getirilmesi Hakkında Kanun Teklifi" http://www2.tbmm.gov.tr/d24/2/2-1121.pdf (Dema Jêgirtinê: 21.05.2015).

BM (Birleşmiş Milletler) Çocuk Hakları Sözleşmesi. (20 Kasım 1989). http://www.cocukvakfi.org.tr/icerik.aspx?id=73 (Dema Jêgirtinê: 19.01.2017).

DUNYA TV, http://www.dunyatv.com.tr/index.php?dil=15&static_content=28 (Dema Jêgirtinê: 21.05.2015).

EXPORTINGIRAQ. (2013) "Kürdistanda Bir İlk: Pelistank Tv" http://exportingiraq.com/kurdistanda-bir-ilk-pelistank-tv-haberi-77.html (Dema Jêgirtinê: 19.01.2017).

GOVARÎ NÊRGIZ, http://www.nergizimindalan.org/govar_pro.php?id=62 (Dema Jêgirtinê: 21.05.2015).

http://www.aa.com.tr/kk/news/220667--qanalek-zarokan-a-nu-zaro-tv (Dema Jêgirtinê: 22.05.2015).

HESEN, Raûf. (12.02.2015) "Belavokî Mindallanî Kurd" *Rojnamey Kurdistanî Nû; Paşkoya Edeb û Huner,* Sal: 24, Hejmar:6603/888, Rûpel: 2-3. http://www.knwe.org/Rojnamekan.aspx?Cor=3 (Dema Jêgirtinê: 19.01.2017)

KURD 1 TV, http://www.kurd1.com/ (Dema Jêgirtinê: 21.05.2015).

KURDMAX PEPÛLE TV, http://www.kurdmaxpepule.tv/ (Dema Jêgirtinê: 22.05.2015).

LEZGÎN, Roşan. (2009) "Hevpeyvîn Bi Serdar Bapîr Re -IV" http://www.zazaki.net/yazdir/haber/hevpeyvn-bi-serhad-bapr-re-iv-363.htm (Dema Jêgirtinê: 20.05.2015).

MUHEMED. Terîfe, (2013) "Xaneyî Sımore", *Rojêkî Nwê, Kurdmax,* https://www.youtube.com/watch?v=W-gaunCP_NI (Dema Jêgirtinê: 19.01.2017).

SAHAR KURDÎ TV, http://kurmanci.sahartv.ir/about_us (Dema Jêgirtinê: 19.01.2017).

SHIWAN, Reza. (2015) "Rageyandinî Mindalan (Beşî Duwem); Govarî Kurdiyekanî Mindalan" http://www.hawpshti.com/ku/?p=4599 (Dema Jêgirtinê: 11.01.2017).

SHIWAN, Reza. (2015) “Rageyandinî Mindalan (Beşî Sêyem); Radyo, Televîzyon, Înternet” http://www.hawpshti.com/ku/?p=4783 (Dema Jêgirtinê: 19.01.2017).

SHIWAN, Reza. (2015) “Rageyandinî Mindalan (Beşî Yekem); Govarekanî Mindalan” http://www.hawpshti.com/ku/?p=4474 (Dema Jêgirtinê: 11.01.2017).

TENYA, Îsmaîl. (20.08.2016) “Rojnamegerî Kurdî (Nihênî û Aşkera) Mindallan (1985-1993)” *Rojnamey Kurdistanî Nû*, Sal: 25, Hejmar: 7049, Rûpel:19-20. http://en.calameo.com/read/000163913f530964f4238 (Dema Jêgirtinê: 19. 01. 2017)

YEĞEN, Mesut. (2009) “Müstakbel-Türkten Sözde Vatandaşa: Cumhuriyet ve Kürtler” *Osmanlı Bankası Arşiv ve Araştırma Merkezi*, Çağdaş Türkiye’nin Oluşumu Seminerleri. http://www.obarsiv.com/pdf/MesutYegen.pdf (Dema Jêgirtinê: 21.05.2015).

ZARO TV, http://www.zarotv.com/ (Dema Jêgirtinê: 19.01.2017).

ZAROK TV, http://zaroktv.com.tr/Kurmanci (Dema Jêgirtinê: 22.05.2015).